
# Dewletê Wan kiriye navenda înfazan

Polîs piştî daxuyaniyên rayedarên dewletê ku dibêjin çeka xwe bê fikar bi kar bînin, bi awayekî ketûber û kêfî diavêjin ser malan û înfazan pêk tînin. Kujer jî ji aliyê darazê ve tên parastin

**POLÎSAN DU JIN ÎNFAZ KIRIN**

Li taxa Emînpaşa ya Artemêta Wanê polîsan di saetên şevê de bi ser malekê de girt û 2 kes înfaz kirin. Li gorî agahiyên şahidên bûyerê polîsan kesek bi birîndarî înfaz kiriye. Şahidan da zanîn ku her du kesên hatine qetilkirin jin in. Dorpêç û gulebarana polîsan heta ber destê sibê dewam kiriye...



**Ev ne cara yekê ye**


Di nava salekê de li Wanê û navçeyên wê Artemêt, Riya Armûşê û Erdîşê di êrîşên tîmên taybet ên bi heman şêweyî de gelek kesên ku di nav de zarok û jin jî hene hatin qetilkirin...


ROJEVA **Medya**

19 Çile Pêncşem 2017 / e-mail: rojevamedya@ hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 70


## Li dijî cangoriyan bêrûmetî

Qeyûmê AKP'ê yê ku Şaredariya Amedê dagir kiriye bi pêkanînên xwe civak bêzar kiriye. Qeyûm herî dawî şehîdgeha li Goristana Yenîkoyê ji bo veşartina cenazeyên sivîlan tahsîs kir. Hevseroka MEYA-DER'ê Ayşe Dîcle got ku qeyûm bi vî awayî dixwaze gel bîne pêşberî hev û xwest dev ji vê pêkanînê berdin ku heta li dijî miriyan jî bêhurmetiyê dike...



R6/7/8

# Çapemenî li ber xwe dide

**Di ser qetilkirina Hrant Dînk re 10 sal derbas bûn. Îro êdî zelal e ku îktîdar ji bo dîktatoriyê rojnamegeran ji xwe re dike qurban. Li vî welatî para rojnamegeran an mirin e yan jî zindan**

**GIRTÎGEHA ROJNAMEGERAN**

Di ser qetilkirina Hran Dînk re 10 sal derbas bûn lê li Tirkiyeyê di warê azadiya çapemeniyê de pêşketin na, lê paşketin çêbûn. Li hemû dinyayê 350 rojameger girtî ne û nîvê wan li Tirkiyeyê ji aliyê AKP'ê ve hatine girtin.

**ROJEKE ROJNAMEGERIYÊ**

Rojnameger Omer Çelîk, Mahîr Kanaat û Tunca Ogreten hatin girtin. Ji rojnameger Saîd Sefa re cezayê muebetê hat xwestin û rojnameger Abdullah Kaya hat binçavkirin. Rojnameger Rod Nordland jî hat dersînorkirin... RÛPEL- 6



**ERZENÎ KESAN SER**

Rojnameger Umît Kivanço ke embazê Hrant Dînkî yo, doza Dînkî ser o wina va: "Hewl danî ke berpirsîyarîya doze bierzî ser tayê kesan."

**DOZÊ NEWEYÎ ABÎY**

Avûkatê Dînkî Hakan Bakırcıogluyî wina va: "Tayê zanayîşê neweyî vejîyayî orte û ganî dozê neweyî hetê mehkeme ra bêrî akerdiş."

**AKP ORTAXÊ SUCÎ YO**

Mudira Weşanê Pêroyî yê Nor Radyo Dîren Cevahîr Şene dîyar kerde ke hukmatê AKPyî zî ortaxê nê sucî yo.

**EWRO YENO VÎRARDIŞ**

Dînk serrgêra 10. de do ewro saet 14.00 de vernîya Rojnameyê Agosî de, reyna saet 20.00 de zî bi meşîyayîş bêro vîrardiş. RÛPEL - 11



## Reqqa dê bibe Kobanêya duyem

Fermandara YPJ'ê Canda Koçer destnîşan kir ku çawa ku hevalên wan bi ruhê berxwedanê Kobanê azad kir, bi heman ruhî hevalên wan tev li pêngava rizgarkirina Reqqayê bûne. Koçer da zanîn ku bi pêşengiya şervanên jin dê Reqqa jî azad bibe û ew çeteyên hov ên DAIŞ'ê derbeke mezin bixwin...

Medya Rûpel - 2



## Dê jin Reqqayê azad bikin

Berdevka Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê Cîhan Şêx Ehmed pêngava duyemîn a Xezeba Firatê nirxand û da zanîn ku tecrubeyên li Kobanê bi dest xistine zemîneke girîng di pêngava Reqqayê de ava kiriye û got ku bi azadkirina Reqqayê re dê hemû çeteyên DAIŞ'ê yên li Reqqayê tune bikin...

Medya Rûpel - 2



## AKP deyn bi deyn werdigire

Li Tirkiyeyê êdî her tişt bi argumanên şerê psîkolojîk tê berovajîkirin. Hikumeta AKP'ê ya di şerê psîkolojîk de pispor e hewl dide têkçûna xwe ya di qada aborî de veşêre. Kurt û kurmancî Tirkiye deydarê IMF'yekê bû lê îro IMF'yek çû, 3 IMF hatin şûna wê. Deynê Tirkiyeyê jî 3 qat zêdetir bû...

Medya Rûpel - 8

## KESK'ê rapora binpêkirina mafan aşkera kir...

R6



## Ji bo azadiyê tê bikoşin

**Tecrîda li Îmraliyê her ku diçe kûr dibe û pê re fikarên der barê tendursitiya Ocalan de jî her diçe zêdetir dibe**

Endama Konseya Serokatiya Giştî ya KCK'ê Sozdar Avesta diyar kir ku ew agahiyê ji Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan nagirin û wiha got: "Em ji tendurstiya Rêberê xwe bi fikar in. Divê gelê me ji bo azadiya Rêberê xwe têkoşînê geş bike." ... RÛPEL-7

## Endamên TJK-E'yê nobeda azadiyê girt

Çalakiya nobedê ya ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ku di 25'ê hezîrana 2012'an de li ber avahiya Konseya Ewropayê dest pê kir, di hefteya 239'an de ji aliyê endamên TJK-E'ya Hollandayê ve hat domandin... R-7



## Ciwanên Azad ji bo meşê bang kir

Koordînasyona Ciwanên Azad têkildarî kampanyaya 'Azad bike' daxuyaniyek da û xwest ku ciwanên li Ewropayê dijîn bi xurtî tev li meşa ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bibin... R-7

Peymana **dagirkirina xaka** Sûriyeyê R4

Beriya dest pê bike **qediya** R4

Vexwendina **çeteyan** bêrûmetî ye R5

www.arsivakurdi.org

# Jin

## Bi keda jinan komele hat avakirin

**KOMELEYA PIŞTEVANIYA JINAN** a Esenyali 150 endamên wê yên fermî hene. Komele bi taybet ji aliyê jinên kurd û elewî ve li Esenyaliyê hatiye avakirin. Li taxa Esenyali ya Pendîkê ya Stenbolê ku piranî kurd û elewî lê dijîn bi pirsgirêkên tiryakî, çete û fuhuşê re rû bi rû ne. Dîsa li Esenyaliyê li şûna veguhestina bajarvaniyê di cih de guherîn pêk tê. Adîle Dogan diyar kir ku di 2013'an de bi kedan jinên karker û karkerên malê komele hatiye avakirin û wiha got: "Em di pêvajoya Geziyê de li Esenyaliyê derketin kolanan. Em bi 300 jinan re hatin cem hev û me nîqaş kirin. Li ser vê yekê fikra avakirina komeleyê derket. Ev der cihê jinên karker e. Jinan her tiştê xwe tev lê kir û tora piştevaniyê ava kir." Dogan anî ziman ku bi komeleyê re xurtir bûne û hatine cem hev. Dogan got ku der barê jin û zarokan de bernameyên wan ên dewlemend hene û her wiha ew li dijî şîdeta li ser jinan jî têkoşînê didin meşandin. **STENBOL - ŞÛJIN**





# 'Reqqa dê bibe Kobanêya duyemîn'

## Jin dê Reqqayê jî azad bikin



Berdevka Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê Cîhan Şêx Ehmed pêngava duyemîn ya Xezeba Firatê nirxand û da zanîn ku tecrubeyên li Kobanê bi dest xistine zemîneke girîng di pêngava Reqqayê de ava kiriye û got ku bi azadkirina Reqqayê re dê hemû çeteyên DAIŞ'ê yên li Reqqayê tune bikin.

Cîhan Şêx diyar kir ku di pêngava duyemîn ya Xezeba Firatê de du baskên ji Eyn Îsa û Kadiriyê derketin rê, bûne yek û ji bo xebata parastinê ava bikin gelek bi pêş ketine û wiha got: "Piştî bask bûn yek 45 gund ji çeteyan hatin paqijkirin. Ji bo aliyê Rojava yê bajar bigirin li qada 10.445 metreçargoşe keleha Caber jî tê de 195 gund û bi dehan qad ji çeteyên DAIŞ'ê hatin paqijkirin. Pêngav bi awayekî serkeftî didome. Morela şervanan gelekî di cih de ye." Cîhan Şêx anî ziman ku pêngava Reqqayê bi pêşengiya jinan dest pê kiriye û got ku ji roja şoreşa Rojava dest pê kiriye heta niha YPJ'ê berpirsyariyeke dîrokî girtiye ser xwe û jinan mohra xwe li serkeftinên mezin daye. Cîhan Şêx destnîşan kir ku ji bo rizgarkirina jinên êzidî û hemû jinên di bin tehdîda DAIŞ'ê de bên rizgarkirin dê tê bikoşin û got ku hêrsa jinên di pêngavê de cih digirin gelekî bilind e û heta dawiyê dê tê bikoşin û çeteyan paqij bikin. Cîhan Şêx herî dawî bang li jinên Reqqayê kir ku di qadên azadiyê de cih bigirin. ***REQQA - ŞÛJIN***

**Fermandara YPJ'ê Canda Koçer destnîşan kir ku çawa ku hevalên wan bi ruhê berxwedanê Kobanê azad kir, bi heman ruhî hevalên wan tev li pêngava rizgarkirina Reqqayê bûne**

Tevî rewşa hewayê ya dijwar jî şer bi dijwarî berdewam dike û şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê guh nadin astengiyan. Fermandara Yekîneyên Parastina Jinan (YPJ) Canda Koçer pêşveçûnên hemleya rizgarkirina Reqqayê nirxandin. Koçer destnîşan kir ku YPJ bersivek baş e ji bo pêvajoyê û wiha got: "Rewşa zivistanê zor e jî, lê asta baweriya rizgarkirinê guh nade astengiyan. Çawa ku me bi ruhê berxwedanê Kobanê azad kir, bi heman ruhî em tev li pêngava rizgarkirina Reqqayê bûne. Em dixwazin di demeke kin de azadiya Reqqayê jî diyarî gel bikin. YPJ'ê bi tevlîbûna xwe ya li hemleya Xezeba Firatê xwedî li pêvajoyê derket."

Koçer da zanîn ku hêza YPJ'ê jî tirseke mezin di dilê çeteyan de ava kir û wiha axivî: "Em ê di demeke kin de mizgîniya rizgarkirina Reqqayê bidin gelê xwe, em nêzî Siwediya Biçûk a ku wek Tebqa bi nav dikin, dibin. Ew jî bajarokekî Reqqayê ye. Êdî em nêzî navenda Reqqayê dibin. Em wek HSD dixwazin ku hemû ciwanên ku tev li me bûne jî perwerde bikin."

Koçer anî ziman ku heya jinek û bihosteke axa wan bindest be ew ê li ber xwe bidin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Em dixwazin stargehekê ji jinên kurd, ereb û hemû pêkhateyên Rojava re bidin çêkirin. Em hêvîdar in ku ew jî tev lê bibin û cihê xwe di rizgarkirina welatê xwe de bigirin. Heya ku jinek bindest be yan jî di bin zilma DAIŞ'e de be, em ê tê bikoşin û xwe bigihînin wan û parastina wan bikin. Ji bo tolhildana hemû jinan me hemleyek di vê astê de daye destpêkirin. Piştî rizgarkirina Kobanê, Kobanê bû hêlîna YPG/YPJ'ê. Rizgarkirina Kobanê ji bo me pîroz e û dîrokî ye. Her wiha hemleya rizgarkina Reqqayê jî di heman astê de ye. Ez wek şervaneke YPJ'ê salvegera rizgarkirina Kobanê li hemû cîhanê, kesên ku canê xwe ji bo rizgarkirina Kobanê feda kir û şehîdan pîroz dikim. Mizgîniya Reqqayê dê bibe Kobanêya duyemîn." ***REQQA - ŞÛJIN***



## Ji DAIŞ'ê rizgar bûn û tev li PKK'ê bûn

ZEYNEP NÊRGIZ BOTAN / BEHDÎNAN - ANF

Du jinên ereb ên ji zilma DAIŞ'ê ji Reqqayê reviyan, tev li nava refên PKK'ê bûne. Her du jî ne bi kurdî ne jî bi tirkî dizanin. Navê yekê Îsyan, navê ya din jî Perwîn e.

Dayika Perwînê di destê DAIŞ'ê de ye. Dayika wê jî piştgirî dayê ji bo tevlîbûnê. Perwînê diyar kir ku ew li Reqqayê diman. Piştî ku DAIŞ hat, bi taybetî ji bo jinan rewşeke gelekî nebaş dest pê kir û wiha got: "Mîna ku jin hemû ketin zindanê. DAIŞ'ê dayika min revand. Li bav û birayê min xistin. Îşkence li wan kirin. Dûre jî ew avêtin hepsê." Perwîn destnîşan dike ji bo ku ew malbata xwe rizgar bike tev li PKK'ê bûye û da zanîn ku ew di heman demê de hatiye ji bo bibe şopdara doza Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan. Perwînê got ji bo ew hemû jinan azad bikin tev li PKK'ê bûne.

Îsyanê jî destnîşan kir ku wê navê xwe kiriye 'Îsyan' ji bo ku tola hemû jinan ji DAIŞ'ê hilîne. Îsyan vê bangê li gelê xwe dike: "Tevlîbûna li nava refên partiya ku ji aliyê Rêber Apo ve hatiye avakirin, xeyala me ya mezin bû. Loma ez tev lê bûm. Bang li her kesî dikim; bila bên û tev li nava PKK'ê bibin. Tu partî mîna PKK'ê jinan naparêze, ji bo azadiyê şer nake. Heta ku hemû jin û her kesên di destê DAIŞ'ê de esîr in, neyên rizgarkirin, em ê dest ji têkoşînê bernedin. Em li çiyê ne û kêfxweş in. Bijî Serok Apo."



Îsyan



Perwîn



## Ji azadî û têkoşînê re erê

Bertekên jinan ên li dijî guherîna makeqanûnê didomin. Endama Lijneya Demokratîk a Gelan Benazîr Coşkun diyar kir ku AKP di desthilatdariya 15 salan de tenê polîtîkayên şer meşandine û di 2016'an de hezar û 926 karkeran jiyana xwe ji dest daye û êrîşên li dijî jinan zêde bûne.

Coşkun da zanîn ku hewl didin pergala serokatiyê bînin û ev tişt anî ziman: "Navê vê veguhertinê serokomarî ye, lê em dizanin ev rejîma dîktatoriyê ye. Desthilatdariya ku heya niha digotin îradeya gel sindoq in, meclis ew jî tune hesibandin. Em bi pergala faşîzan re rû bi rû ne. Jin bêhtir ji vê desthilatdariyê zirarê dibînin."

Coşkun got ku divê hemû jin ji bo azadiyan tê bikoşin û wiha axivî: "Em ji serokatiyê re dibêjin 'na'. Em ji referandûmê re dibêjin 'na'. Em ji azadiya jinan re dibêjin erê. Tişta em jê re bibêjin erê, têkoşîna rizgariya jinan e, têkoşîna azadî û wekheviyê ye." ***STENBOL - ŞÛJIN***



## Şehla Mihemediyanî 14 roj e di grevê de ye



Li gorî nûçeya malpera Mafên Mirovan a Hengaw, Şehla Mihemediyanî (28) xwendekar e û ji bajarê Mehabadê yê rojhilatê Kurdistanê ye û ji 6'ê çileyê ve li Girtîgeha Tebrêz a Îranê dest bi çalakiya greva birçîbûnê kiriye.

Hat diyarkirin ku Şehla Mihemediyanî li dijî zextên rayedarên girtîgehê û her wiha ji ber girtina birayê xwe yê bi navê Hêmin ji aliyê hêzên Îtlaata rejîma Îranê ve dest bi çalakiya greva birçîbûnê kiriye. Şehla Mihemediyanî di 2015'an de ji aliyê rejîma Îranê ve hat girtin û di 18'ê kanûna 2016'ê de bi îdiaya 'endambûna hizbeke kurdî û propagandaya dijqanûnî kiriye' ji aliyê Dadgeha Mehabadê ve çar sal ceza jê re hatiye birîn û ew şandin Girtîgeha Tebrêzê. Her wiha Şehla Mihemediyanî 67 rojan di odeya yekkesî de di bin lêpirsîn û işkenceya hêzên Îtlaata Mehabadê de bû. ***SILÊMANÎ - ROJNEWS***

ROJEVA Medya
19 Çile 2017 Pêncşem

# Wan bûye navenda înfazan

**Hat diyarkirin ku li Artemêtê polîsan bi ser malekê de girt û di serdagirtinê de kesek hate kuştin, kesek jî birîndar bû. Kesa birîndar jî bi saxî hatiye kuştin. Her wiha dewletê Wanê veguherandiya navenda înfazan**

Hat diyarkirin ku li taxa Emînpaşa ya Artemêta Wanê polîsan bi ser malekê de girt û ji 2 kesan kesek bi birîndarî girt û înfaz kir. Li gorî gotinên şahidên bûyerê, mala ku ji aliyê gelek wesayîtên zirxî ve hat dorpêçkirin, bi alîkariya hewayî tîmên taybet bi ser malê de girt.

Piştî ji wesayîta zirxî anons hat kirin Ayşe Mamuk a 60 salî, zarokên wê Zeynep (24), Bahar (22), Fatma (20) û Azad (18) dema ji malê derketin, hatin binçavkirin. Dema 5 kesên hatin binçavkirin dibirin Midûriyeta Polîsan a Bajar, mala wan ji aliyê wesayîtên zirxî ve hat gulebarankirin.

**BIRÎNDAR ÎNFAZ KIRIN**

Şahidên bûyerê diyar kir ku mal hat gulebarankirin, piştî gulebarana destpêkê ji malê dengê çekan hat, piştre di odeya malê ya piştê de teqînek pêk hat. Şahidên bûyerê anî ziman ku jinekê bombeya li ser xwe teqandiye û jiyana xwe ji dest daye û jinek jî ji aliyê tîmên taybet ên ketine malê bi birîndarî hatiye înfazkirin. Nehat zanîn cenazeyên her du jinan birine ku derê. *WAN- DÎHABER*



## Ev ne yekemîn e

**DI NAVA SALEKÊ** de li taxa Xaçort, navçeya Artemêt, Riya Armûşê û Erdîşê heta niha, di serdagirtinên tîmên taybet ên bi heman şêweyî de gelek kesên ku di nava wan de zarok, jin û pîr jî hene jiyana xwe ji dest dan. Di nava îdiayên înfazê de di 10'ê çileya 2016'an ku di encama serdegirtina malê ya li taxa Yenîmahale ya Artemêtê pek hat de 12 PKK'î hatin jehrîkirin û hatibûn qetilkirin.

Li bajar, di 19'ê nîsana 2016'an de li taxa Hacibekîr Remziye Bor a 30 salî û 7 meh bû ducanî, di 26'ê tîrmehê de li heman taxê Tahîr Çaylak ê 75 salî, di 30'ê tebaxê de li Kolana Surmelî 2 zarokên 17 salî û li taxa Çelebîbag a Erdîşê di 18'ê mijdarê de Hediye Ataman di mala ku agir pêxistin de jiyana xwe ji dest da.

# Li Bremenê jineke ducanî hat kuştin

Li gorî nûçeya Yenî Ozgur Polîtîkayê Cevdet Keleş ê ji Erzîromê ye û li semta Vegesack a bajarê Bremen ê Almanyayê dimîne, hevjîna xwe ya 40 salî ya ji Mêrdînê bi rengekî hovane kuşt. Keleş, serê hevjîna xwe ya dixwest jê cihê bibe eciqand û kuşt. Keleş hat binçavkirin. Serdozger Frank Passade ku lêpirsîna bûyerê dike da xuyakirin ku Keleş li sûcê xwe mikur hatiye û gotiye, bi kerpîçê çend caran li serê hevjîna xwe ya ku 9 meh e ducanî ye, xistiye û ew kuştiye. Tevî jina ku navê wê nehat aşkerakirin, pitika di zikê wê de jî jiyana xwe ji dest da. **BREMEN**

# 'Li Cizîrê qetlîam heye' sûc e!

Li navçeya Qereçobanê ya Erziromê, Omer Ugun ê di 15'ê çileyê de di serdagirtina malê de hat girtin, parvekirinên wî yên li ser Facebookê wek sûc hatin hesibandin û Ugun ji ber van parvekirinên xwe bi îdiaya "Propagandaya rêxistinê kiriye" hat girtin. Parvekirinên wî yên ku tê îdiakirin sûc in, dema li Silêmaniyeyê beşdarî Newrozê bûye û li ber wêneyê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan wêne kişandine û parvekirina wî ya "Li Cizîrê qetlîam heye" ya ji bo balê bikêşe ser mirina sivîlan wek amûrên sûc hatin dîtin. Ugun destnîşan kir ku parvekirinên wî ne parvekirinên "Propagandaya rêxistinê" ne û got ku ew nikare li hemberî ew qas mirinên li vî welatî bê deng bimîne. **ERZIROM**




# Îstîsmarkar hat berdan!

Li Rihayê zarokê 12 salî yê diçe pola 7'an salek û nîv rastî îstîsmara zayendî ya bavê xwe M.O hat. Ev bûyer di meha kanûna borî de mamosteyê rehberê derxist holê. Mamoste M. rêveberiya dibistanê agahdar kir lê rêveberiyê tiştek nekir û li ser vê mamoste serî li polîs da. Polîsan zarok ji dibistanê girt û zarok got ev salek û nîv e rastî îstîsmara bavê xwe tê. Li vir M.O hat binçavkirin lê sûc red kir. M.O piştî îfadeya xwe ya emniyetê derxistin dozgeriyê û sewqî dadgehê hat kirin. Tevî îfadeya zarok M.O hat berdan. Dadgehê biryar da ku zarok jî li wargehê bê bicihkirin. **RIHA**



# 142 karker ji kar hatin derxistin

Li navçeya Şîrwanê 142 karkerên ku li Kana Madenê ya Koma Cinerê ku di 17 mijdarê de hezan pêk hatibû û 16 karkeran jiyana xwe ji dest dabû, ji kar hatin dûrxistin. 4 fîrmayên taşeron berê jî 200 karker ji kar dûr xistibûn. Hatibû diyarkirin ku fîrmaya dê dawî li karê 460 karkerên kanê bînin û li şûna wan karkeran ji Çînê bînin. **SÊRT**

# Îşkence li mirî û zindiyan dikin

Pêkanînên qeyûmê li Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê bi cih bûye, nîşan didin ku xweranegirtina desthilatdariya AKP'ê li zindî û miriyên kurdan derketiye asta herî bilind. Qeyûm, ji roja tayînkirinê û vir ve ji bo cenazeyên şervanên li qadên xwerêveberiyê û çiyayên Kurdistanê şehîd bûne neyên veşartin, çi bêhiqûqî hebe, wê dike. Herî dawî li beşa Şehîdgehê ya Goristana Yenîkoyê kir ku malbat cenazeyên sivîlan veşêrin û bi vî rengî ev qad dagirt.



Ji ber tijîbûna vê herêmê, cenazeyên şervanan li cihên cuda yên goristanê tên veşartin. Hevseroka MEYA-DER'ê Ayşe Dîcle nerazîbûn nîşanî vê da û wiha got: "Zîhniyeta dewletê ku cenazeyan dişewitîne, parçe dike, teşhîr dike û bi mehan li morgan disekinîne, xuya ye têr nebûye; ku ji bo hilanîna tolê îşkenceyê li miriyan û bi rêya miriyan li zindiyan dike.

**LÎSTIKA QIREJÎ**

Dîcle anî ziman ku ji bo şehîdgeh careke din neyê bikaranîn, li cihên vala cenazeyên sivîlan bi zorê dan veşartin û wiha dewam kir: "Me malbatên ku naxwazin cenazeyên xwe li şehîdgehê veşêrin dîtin. Piraniya malbatan ji vê rewşê aciz e. Tevî ku naxwazin cenazeyên sivîl ên xizmên wan li şehîdgehê werin veşartin jî karkerên ji aliyê qeyûm ve hatine wezîfedarkirin dibêjin, ji bilî cihê ji wan re hatiye gotin, ew ê nikaribin cenaze li cihekî din veşêrin. Karker neçar hatine hiştin. Bi rêya vê polîtîkayê xwestin malbatan li ber hev rakin, lê bi ser neketin." *AMED - ANF*

## Kapasîte 500 kes e, hezar kes lê dimînin!

**GIRIYÊN SIYASÎ** yên li Girtîgeha Tîpa E ya Sêrtê dimînin, bi rêya malbat û parêzerên xwe binpêkirinên mafan ên li girtîgehê ragihandin. Hat ragihandin ku li girtîgeha ku kapasîteya wê 500 kes e, zêdeyî hezar kes lê dimînin. Li koguşên 8 kesî, 15-18 kes lê dimînin û her wiha li koguşên 12 kesî 20 kes, li yên 18 kesî 32 kes tên ragirtin. Li gel van, bi hinceta OHAL'ê faaliyetên spor, atolyeyê û sohbetên girtiyan jî tên astengkirin.

Gelek caran nameyên girtiyan jî yan nayên dayîn an jî dereng didin wan. Her wiha pirtûkên ji girtîgehê re tên şandin jî ji girtiyan re tê gotin "hûn terorîst in" û bi vî awayî nayên dayîn. Piştî vê girtiyên ku li dozgeriyê îtiraz kirin, hat îdiakirin ku "biryara berhevkirinê" ya pirtûkan heye û bi vî awayî hîn jî heman qedexe berdewam dike. **SÊRT - DÎHABER**

# Ciwanên AKP'ê ji ber DAIŞ'ê hatin binçavkirin

Li Wanê, di 8'ê kanûna 2016'an de di çarçoveya operasyonên DAIŞ'ê de di serdagirtinên malan ên hemwext de 7 kes hatibûn binçavkirin û di 3'ê çileyê de bi tawanbariya "Endamtiya rêxistina çekdarî" hatibûn girtin. Ji bersûcên hatin girtin F.M., ji îfadeya wî tê fêmkirin ku berê ji bo tev li DAIŞ'ê bibe çûye Dîlokê, li ser sînor ji aliyê leşkeran ve hatiye girtin û piştî îfadedayînê serbest hatiye berdan. F.M. di parastina xwe de li xwe mikur hat ku wî sala çûyî xwestiye bi rêyên qaçax derbasî bajarokê Tilaferê yê Mûsilê bibe û ji wir jî tev li DAIŞ'ê bibe. F.M. di parêziya xwe de wiha dibêje: "Ez ê ji Karqamişê derbasî Sûriyeyê bibûma, ji wir jî ez ê derbasî Tilaferê bibûma. Fikra min ew bû ku bi rêyên qaçax derbas bibim. Berî ku em ji sînor derbas bibin em hatin girtin. Li qereqolê îfadeya me hat wergirtin û em hatin berdan."

**PARASTINA SOSRET**

Ji bersûcên ku bi tawanbariya "Endamtiya rêxistina çekdarî" hat girtin yek jî M.F.B. ye. Di girtenameyê de tê diyarkirin ku M.F.B. di demên cuda de di Baskên Ciwanan ên AKP'ê de xebitiye.

Li dadgehê parêzerê bersûc wiha parastina M. F.B. kir: "Ew bi xwe di Baskên Ciwanan ên AKP'ê de xebitiye. Bav û kekê muwekîlê min jî ew kes in ku xizmeta dewletê dikin. Di wê qenaetê de me ku tu sûcekî muwekîlê min tune ye." *WAN - DÎHABER*

## Ebru Tîmtîk: Em ê bi ser bikevin




Parêzer Ebru Tîmtîk li dijî girtina birayê wê û hevpîşeyê wê Barkin Tîmtîk ku bi awayekî dijhiqûqî hatin girtin, li ber Edliyeya Çaglayanê nobeda edaletê girt û wiha got: "Dema mirov lêdanê bixwin mirov têk naçin. Dema mirov îşkenceyê bibînin mirov têk naçin. Ji ber vê em ji girtîbûnê bi serkeftî derdikevin. Em her ku li ber xwe bidin em ê zêdetir girêdayî hev bin û ji hev hêzê bigirin. Baweriya me bi têkoşîna me zêde dibe. Ji ber vê em kêfxweş in."

Tîmtîk behsa kêmasiyên hiqûqî kir û da zanîn ku wan berxwedana xwe bi rêya hiqûqî nîşan daye û anî ziman ku di dosyayê de tu delîl tune ne. Tîmtîk di berdewamê de bi lêv kir ku bi OHAL'ê re cihê hiqûqê çekan û mîlîtarîzmê girtiye û wiha got: "Dema Barkin birine girtîgehê îşkence lê kirine. Tol ji Barkin girtin. Polîs ji parêzeran hez nakin. Hela ji parêzerên li dijî wan qet hez nakin. Li dijî parêzerên buroya me bi kîn in." *STENBOL - ŞÛJIN*

www.arsivakurdi.org

## Li şûna Boko Haramê li penaberan dan

**DI VAN ROJAN DE** ku li Nîjeryayê li dijî çeteyên Boko Haramê têkoşîneke xurt tê meşandin, ji aliyê dewletê ve şaşiyeke mezin pêk hat. Hêzên Hewayî yên Nîjeryayê li şûna çeperên Boko Haramê wargeheke penaberên ku ji destê çeteyên Boko Haramê ji cih û warên xwe koçber bûbûn, bombebaran kirin. Di encama bombebaranê de herî kêm 100 penaberên li wargehê jiyana xwe ji dest da û gelek penaber jî birîndar bûn. Hat ragihandin ku di nav kesên jiyana xwe ji dest daye de berpirsyarên alîkariyê jî hene. Her wiha hikumeta Nîjeryayê jî der barê bombebaranê de daxuyaniyek da û qebûl kir ku wargeheke penaberan ji aliyê Hêzên Hewayî yên Nîjeryayê ve hatiye bomberankirin. **ABUJA**



# Peymana dagirkirina Sûriyeyê

**Îran û Sûriyeyê di bin navê pêşxistina aboriya Sûriyeyê de li dijî kurdan peymaneke aboriyê îmze kir. Bi peymana ku hatiye îmzekirin re beşeke xaka Sûriyeyê ji aliyê Îranê ve tê dagirkirin**

Di van rojan de ku tê payîn di navbera rejîma Baasê û rêxistinên cihadîst ên ku di bin navê muxalefeta Sûriyeyê de hatin birêxistinkirin de, hevdîtinên Astanayê dest pê bikin, di navbera Sûriye û Îranê de peymanake nû hat îmzekirin. Serokwezîrê Sûriyeyê Îmad Xemîs ê ku li paytexta Îranê Tehranê bi alîkarê serokomarê Îranê Îshaq Cîhangîr re hevdîtin pêk anî, peymaneke aboriyê ku ji 5 xalan pêk tê, îmze kir.

Li gorî vê peymanê Sûriyeyê rêvebirina 5 projeyên navborî radestî Îranê kiriye. Di çarçoveya peymanê de dê erdê çandiniyê yê ji 5 hezar hektaran pêk tê ji bo Madena Fosfat a El Şerqiye û erdê ji 100 hezar hektarî pêk tê jî ji bo avakirina termînala petrol û gazê radestî Îranê bê kirin. Di heman demê de dê belgeya destûrê ya operatora GSM'ê û projeya dermaletiyê jî dewrî Îranê bê kirin.



## NY jî hat vexwendin

**AMEDAKARÎ Û vexwendinên hevdîtinên Astanayê yên ku kurd jê re nehatine vexwendin, berdewam dikin. Piştî vexwendina Amerîkayê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (NY) jî ji bo hevdîtinên Astanayê hat vexwendin. Berdevkê Sekreteriya Giştî yê Neteweyên Yekbûyî (NY) Farhan Haq der barê vexwendina NY'yê de axivî û diyar kir ku ew bi awayekî fermî ji bo hevdîtinên Astanayê hatine vexwendin. Berdevk Haq da zanîn ku ew dê bi şandeyekê tev li hevdîtinên Astanayê bibin û nerînên xwe yên çareseriya aloziya Sûriyeyê bînin ziman.**

**HEDEF KURD IN**

Trafîka dîplomatîk a di navbera Rûsya, Îran, Tirkiye û Sûriyeyê de ya di rojên dawîn de, heke mirov bala xwe bidê, bi awayekî zelal bibîne ku ev trafîk ne ji bo çareseriya aloziya Sûriyeyê ye û tenê armanca vê trafîkê heye, ew jî dagirkirina bakurê Sûriyeyê û destkeftiyên gelê kurd in.

Bi vê peymana ku Îran xaka Sûriyeyê dagir dike jî, dertê holê ku peyman her çi qas ji bo pêşxistina aboriya Sûriyeyê hatibe îmzekirin jî, armanca peymanê dagirkirina xaka Sûriyeyê û destkeftiyên gelê kurd e.

## Li Ewropayê azadî kêm dibe

Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî (Amnesty International) der barê azadî û mafên bingehîn ên welatên Ewropayê de lêkolînek kir. Rêxistinê encamên lêkolînê li paytexta Fransa Parîsê di konferansekê de ji çapemeniyê re parve kirin. Li gorî lêkolîna ku hatiye kirin, pêla terorîzma îslamîst azadî û mafên bingehîn ên li welatên Ewropayê di 2 salên dawîn de kêm kiriye û polîtîkayên ewlekarîparêziyê zêde kirine.

Li gorî lêkolînê li Brîtanyayê di destpêka salên 2000'î de qanûn pir hatine tundkirin û li gel vê yekê jî pirsgirêka ewlehiyê ya li Brîtanyayê nehatiye çareserkirin. Di lêkolînê de komkujiyên çeteyên DAIŞ'ê, bi taybetî jî yên li Fransa û Belçîkayê hatine bibîrxistin û hatiye diyarkirin ku ji ber van komkujiyan li Fransayê rewşa awarte hatiye ragihandin.

Li aliyê din di lêkolînê de hatiye ragihandin ku pêkanînên mîna şopandin û guhdarîkirinê yên li Almanya, Awusturya, Polonya, Hollanda û gelek welatên din ên Ewropayê ku bi qanûnan tên kirin, pêşî li azadiya şexsî girtiye. Her wiha di lêkolînê de hatiye destnîşankirin ku rêya welatên Ewropayê li dijî terorîzmê hilbijartiye, rêyeke xeternak e. ***PARÎS***

## Mizgefta Mezin a Mûsilê rizgar bû

Artêşa Iraqê di çorveya qonaxa duyemîn a operasyona rizgarkirina Mûsilê de li dijî çeteyên DAIŞ'ê pêşveçûna xwe berdewam dike. Artêşa Iraqê derbên mezin li çeteyên DAIŞ'ê dixe û gelek deverên di bin kontrola çeteyan de rizgar dike.

Fermandarê Odeya Operasyonê ya Nînovayê Ebdulemîr Reşîd Yarella der barê pêşveçûnên artêşa Iraqê de daxuyaniyek da û diyar kir ku Mizgefta Mezin a Mûsilê û taxên bi navên Cezaîr, Dergezliye û Ziraeyî yên dikevin rojhilatê Mûsilê ji çeteyên DAIŞ'ê rizgar kirine.

Emîrê Giştî yê DAIŞ'ê Ebûbekir Bexdadî li Mûsilê cara yekemîn li Mizgefta Mezin a Mûsilê axivîbû û bang li gelê Mûsilê kiribû ku li dijî artêşa Iraqê şer bike. Ji ber vê yekê rizgarkirina Mizgefta Mezin a Mûsilê gelekî girîng e.

Her wiha ji aliyê Wezareta Parastina Iraqê ve hat ragihandin ku 8 kargehên çêkirina wesayîtên bombebarkirî yên nêzî navçeya Telaferê, ji aliyê balafirên şer ên artêşa Iraqê ve hatine bombebarankirin û rûxandin. ***MÛSIL***



## Beriya pêk bê qediya

Ji civîna Astanayê re bi tenê çend roj man. Heke neyê taloqkirin dê 23'yê mehê civîn dest pê bike. Ber bi nêzbûna civînê re daxuyaniyên ji aliyê Rûsya, Îran û Tirkiyeyê ve tên dayîn dike ku mirov li ser daxuyaniyan çend tiştan bibêje.

Dewleta tirk a ku hemû polîtîkayên xwe ji bo têkbirin û dijminatiya kurdan diyar dike ku dê tu carî nûnerên kurdan qebûl nekin. Di vê polîtîkayê de dijminê qedîm lê dostê konjonkturî yê Tirkiyeyê Îran jî di heman pozîsyonê de ye. Wê jî dijminatiya xwe ya li dijî kurdan bi qasî misqalekê kêm nekiriye lê zêde kiriye.

Di nav aliyan de daxuyaniyên ji aliyê rayedarên rûs ve tên dayîn her çend dilê hin 'kurdan' xweş kiribe jî, di esasê xwe de rûs jî reş dikin û dilê xwedî pê xweş dikin. Çawa? Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Lavrov diyar kir ku ji ber ku di civînên Cenevreyê û yên dîtir de muxatabên esas nayên vexwendin û nîqaş bi wan re nayê meşandin, têk diçin. Camêr li gel van gotinên xwe jî îmtîna kir ku navê PYD'ê bi lêv bike.

Girêk

**Reşo Wasif**

Lavrov diyar kir ku armanca Astanayê ew e ku agirbesta li Sûriyeyê bidome û anî ziman ku di civînê de lazim e aliyên ku şer dikin, werin temsîlkirin. Lavrov got ku ne bi tenê aliyên ku agirbest îmze kirin, divê hemû alî beşdar bibin. Di ser de jî got ku wan DYA jî vexwendiye. Gotina Lavrov a dê gelên Sûriyeyê têkildarî çarenûsa xwe biryarê bidin û federalî jî dikare bê nîqaşkirin, belkî aliyê herî girîng ê daxuyaniya wî bû.

Lê dema mirov rewşê li elek û bêjingê dixe mirov dibîne ku hêzên navborî der barê kurdan de ji bilî dijminatî û mijûlkirinê ne samîmî ne. Duh li ser gelek ajansan nûçeyeke digot ew ê li ser navê 'kurdan' ENKS tev li Astanayê bibe. ENKS'a ku wekî sazûmaniyekê dijberiya Şoreşa Rojava û Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê dike, helbet ne nûnera kurdan e. Lê wekî nûner bangkirina wê; xuya ye ku bi zora Tirkiye û Îranê ye. Jixwe par dema dewleta tirk bajarên kurdan bi tang, top, helîkopter û balafiran wêran dikirin, ENKS li Rihayê li hev civand û jê komeke din da avakirin da ku li dijî Şoreşa Rojava di nav provokasyonan de be.

Li vê derê dîsa dîrok derseke mezin dide hemû aliyan; tenê têkoşer dikarin çarenûsa xwe diyar bikin. Di vexwendina ENKS'ê de meqseda aliyan ew e ku siberojê bibêjin me kurd vexwedin û civîna xwe pê meşûr bikin. Lê gelê ku di qadeke wekî Rojhilata Navîn de şoreş di nav şoreşê de pêk tîne, dê bi pêşxistina federaliyê û jiyana hevbeş siberojê aliyan bîne ser xeta xwe.

***

Mijareke din a ku hemû dinyayê eleqder dike jî rewşa Donald Trump e. Trump 20'ê mehê dê dest bi kar bike. Her çi qas hin daxuyaniyên radikal jî dabin, divê bê zanîn ku polîtîkayên dewletan ji aliyê kesan ve nayên bipêşxistin. Stratejî heman stratejî ne lê taktîk diguherin. Di nav 8 salên Obama de 4 salên dawîn ji bo kurd û Kurdistanê hem çareserî hem jî jenosîd bû. Trump dibêje ew ê bi kurdan re têkiliyan xurt dayne lê heke ew jî li ser rêya selefê xwe be, tu xêr ji wî jî tune ye.

## Li Çînê kaneke komirê hilweşiya

Li bajarê Şuocouya yê girêdayî parêzgeha Şanşi ya bakurê Çînê kaneke komirê hilweşiya. Di encama hilweşîna kanê de 10 kedkar di bin komirê de man û ji van karkeran tenê yek hat rizgarkirin û 9 kedkaran jî jiyana xwe ji dest da. Li Çînê di meha borî de jî li Çînê gelek kanên komirê hilweşiyan û herî kêm 40 karkerên kanên komirê jiyana xwe ji dest da. **PEKÎN**

## Li Şamê êrîşeke bombeyî pêk hat

Li paytexta Sûriyeyê Şamê li dijî leşkerên rejîma Baasê êrîşeke bombeyî pêk hat û di encama êrîşê de generalek û 8 leşkerên rejîma Baasê jiyana xwe ji dest da. Saziya Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyeyê (SOHR) der barê êrîşê de daxuyaniyek da û ragihand ku ji ber êrîşê 15 kesên sivîl jî winda ne. Çend roj beriya niha jî li Şamê teqînek pêk hatibû. **ŞAM**

www.arsivakurdi.org

## Îlham Ehmed bi hikumeta nû re civiya

NAZDAR EBDÎ / QAMIŞLO - ANHA

Hevseroka MSD'ê Îlham Ehmed li Washingtonê bi hikumeta nû ya Amerîkayê re civînek li dar xist.

Şandeyek a ku ji Hevseroka Meclisa Sûriyeya Demokratîk (MSD) Îlham Ehmed û Serokê Meclisa Suryanî Besam Îshaq jî di nav de, demek berê ji bo hevdîtina bi hikumeta nû ya Amerîkayê re çûbû Washingtonê. Îlham Ehmed diyar kir ku wan bi rayedarên gelek navandên lêkolînê, saziyên bibandor ên di avakirina hikumeta nû de û rayedarên buroyên hikumetê re hevdîtin pêk anîne.

Şandeyê her wiha bi şêwirmendê kampanyaya propagandayê yê Donald Turamp ê bi navê Gabriyel Soma re jî hevdîtin pêk anî û nêrîna wan ji bo aloziya Sûriyeyê nîqaş kir. Her wiha Îlham Ehmed bi kurdistaniyên li Amerîkayê û amerîkiyan re li bajarê Rhode Islandê sempozyumek li dar xist. Di sempozyumê de Îlham Ehmed diyar kir ku projeya wan erênî tê nirxandin.

Têkildarî helwesta muxalefeta Sûriyeyê jî Îlham Ehmed da zanîn ku ji ber hin girêdanên xwe yên herêmî ditirsin bi wan re danûstandinan bikin. Demek berê jî Îlham Ehmed çûbû paytexta Amerîkayê û bi şêwirmendê Donald Turamp ê karûbarên Rojhilata Navîn Welîd Faris re civiyabû.





## Astana ne ji bo çareseriyê ye

Serokê Meclisa Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ê Kantona Cizîrê Ebdulkerîm Sarûxan diyar kir ku ên ku tev li Astanyê bûn nûnertiya gelên Sûriyeyê nakin û da zanîn ku biryarên ji Astanayê derdikevin wan eleqedar nakin.

Ebdulkerîm Sarûxan anî ziman ku hêz û kesên ji bo Astanayê hatine vexwendin tenê nûnertiya berjewendiyên hêzên hundir û derve dikin û ev nirxandin kir: "Civînên ku em tev lê nebûn, biryarên wê jî me eleqedar nakin. Hêzên ku di çareseriyê de bi bandor in, nehatine vexwendin. Ev jî tê wateya ku civîn beriya dest pê bike vala ye. Ev hêz di çareseriyê de ne cidî ne."

**'EM AMADE NE'**

Sarûxan di dawiyê de jî ev tişt got: "Nûnerên rêveberiyên xweser û hêzên demokratîk nûnertiya hemû gelan dikin lê nehatine vexwendin. Ev jî têkçûna civînê radixe ber çavan. Em wek rêveberiya xweser ji hemû danûstandinan re amade ne û dikarin projeyên xwe pêşkêş bikin." AMÛDÊ - ANHA



## Gel ne Astanayê federaliyê dixwaze

Welatiyên Helebê anî ziman ku civîna Astanayê bi tu awayî bi sernakeve û da zanîn ku tekane rêya çareseriyê federaliya demokratîk e.

Jina bi navê Alfet Hesen diyar kir ku ji derveyî hêzên demokratîk hemû hêzên terorîst hatine vexwendin û destnîşan kir ku dê ev civîn têk biçe. Alfet Hesen da zanîn ku di federaliya demokratîk de destwerdana hêzên derve tê redkirin û hemû gel wekhev tên dîtin.

**SEDEMA TÊKÇÛNÊ**

Ehmed Şehade jî da zanîn ku civîna Astanayê ji hêla hêzên terorperest ve tê lidarxistin û wiha bi dawî kir: "Ev jî nîşaneya têkçûna civînê ye. Bi nevexwendina hêzên demokratîk dixwazin berjewendiyên xwe biparêzin. Tirkiyeyê tenê hêzên terorîst vexwendine û ev jî dê civînê têk bibe." HELEB - ANHA

# 'Vexwendina çeteyan li dijî gel bêrûmetî ye'

**Bertekên li dijî civîna Astanayê rastî bertekên gelê Rojava tên. Siyasetmedarên kurd anî ziman ku Tirkiye bi vê civînê komên çete rewa dike û da zanîn ku vexwendina çeteyan bêrûmetiya li dijî gelê Sûriyeyê ye**

HÊLAN CELAL / GIRKÊ LEGÊ - ANHA

Siyasetmedarên kurd destnîşan kir ku vexwendina hêzên selefî di civîna Astanayê de nîşaneya bêrûmetiya li dijî gelên Sûriyeyê ye û da zanîn ku tekane rêya çareseriyê jî federaliya demokratîk e.

Têkildarî mijarê endamê Polîtburoya Partiya Çep a Kurd li Sûriyeyê û Cîgirê Hevserokatiya Kantona Cizîrê Şêxmûs Mûsa diyar kir ku ji ber ku hêzên demokratîk nehatine vexwendin, Astana jî dê mîna civînên din têk biçe û wiha domand: "Tu daxwazên van hêzan ji bo çareseriyê tune ne.



Şêxmûs Mûsa



Ebdulhelîm Ehmed

Alozî jî her ku diçe kûrtir dibe. Pêdivî bi tevlibûna hêzên demokratîk dixwazin çareseriyê pêk bînin, heye."

**ÇETEYAN REWA DIKIN**

Di berdewamê de Mûsa got ku Tirkiye bi hebûna xwe ya di Astanayê de komên çete rewa dike û ev nirxandin kir: "Dixwaze kurdan jî ji van danûstandinan dûr bixe. Ne pêkan e ku civînên bi vî rengî aloziyê çareser bikin. Rêya çareseriyê federaliya demokratîk e ku mafê hemû gelan misoger dike."

**ARMANCA TIRKIYEYÊ**

Endamê Rêveberiya Partiya Kedkaran a Kurdistanî Ebdulhelîm Ehmed jî da zanîn ku heta niha tu civînên ji bo Sûriyeyê bi ser neketine û wiha pê de çû: "Ji ber ku beyî nûnerên gel pêk hatin. Tirkiye dixwaze hêzên demokratîk ji civînê dûr bixe. Ji ber vê yekê jî ev civîn dê têk biçe. Tenê li gorî ajandayên hin hêzan pêk tê. Vexwendina hêzên selefî di civînê de, bêrûmetiya li dijî gelên Sûriyeyê ye."


# Mayînên çeteyan Aya bê ling hişt!

Ji ber mayîna çeteyên DAIŞ'ê lingekî zaroka 11 salî jê bû û lingê wê yê din jî seqet bûye.

Zaroka 11 salî ya bi navê Aya Îsa dema ku li gel malbata xwe ji ber topbarana artêşa tirk a dagirker a li dijî gundê Moran ê rojavayê Minbicê direviyan, mayîna ku çeteyên DAIŞ'ê li nêzî gundê wan çandibû di bin Ayayê de teqiya. Di encama teqînê de lingekî wê jê bû û yê din jî seqet bû.

**DAXWAZA MALBATÊ**

Malbata Aya ji 5 kesan pêk tê. Du xwîşk û birayekî wê yên jê biçûktir hene. Malbat li taxa Esediyê yê Minbicê bi cih bûye. Ji ber rewşa malbatê ya xerab, Aya heta niha bê derman maye. Malbata Aya bang li rêxistinên mirovî yên navneteweyî kir ku alîkariya wan bikin. *MINBIC - ANHA*



## Reqqayî xwe bi rêxistin dikin

Welatiyên Reqqayê da zanîn ku ew gundên xwe bi rêxistin dikin û diyar kir ku federaliya demokratîk rêya çareseriyê ye.

Şêxê eşîra El Bû, Şeban Hisên El Şêx destnîşan kir ku ew gundên rizgarkirî bi rêxistin dikin û wiha dom kir: "Dê hêzên HSD'ê Reqqayê jî rizgar bikin. Tekane rêya çareseriyê jî federaliya demokratîk e."

**ÇAVKANIYA ÇARESERIYÊ**

Ebdullah El Eryan jî got ku eşîrên ereb ên herêmê jî bo rizgarkirina Reqqayê di her alî de dê bibin alîkar û wiha bi dawî kir: "Îro bi hezaran ciwanên ereb tev li HSD'ê dibin û li dijî çeteyan şer dikin. Federaliya demokratîk jî çavkaniya îradeya hemû gelan e û rêya çareseriyê ye." REQQA - ANHA

## Çeteyên hov zarokan bi kar tînin

Şervanên Xezeba Firatê zarokên ku ji aliyê çeteyan ve dihatin bikaranîn, rizgar kirin.

Di roja 39'emîn a qonaxa duyemîn a Hemleya Xezeba Firatê de şervanên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê li gundekî Reqqayê hin zarokên ku ji hêla komên çete yên DAIŞ'ê ve dihatin bikaranîn, rizgar kirin û radestî malbatên wan kirin.

Di dema operasyona şervanan ên li dijî gundan de zarokên ku çek di destê wan de bûn, hatin rizgarkirin û şervanan dest danî ser çekên wan. Têkildarî mijarê şervanan got ku çeteyên DAIŞ'ê gelek sivîlan ji bo xwe dike mertalên zindî û zarokan jî bi vê armancê bi kar tîne. Zarokan jî da zanîn ku komên çete bi darê zorê çek dane wan. REQQA - ANHA

## Koçberan banga alîkariyê kir

Koçberên Reqqayê yên li kampa Eyn Îsayê da zanîn ku pêdiviya wan bi alîkariya lezgîn heye. Der barê mijarê de jina bi navê Zehra Ebdulsemed anî ziman ku her çi qas rizgarbûna wan cihê kêfxweşiyê be jî pêdiviya wan bi alîkariyê jî heye û got ku ew bi hêzên HSD'ê bawer in. Jina bi navê Xaliya El Mehmûd jî anî ziman ku pêdiviya wan bi alîkariya mirovî heye û bang li rêxistinên navneteweyî kir ku alîkariyê ji wan re bişînin. Xaliya El Mehmûd ji bo alîkariyê jî spasiya rêveberên kampê kir. KOBANÊ



## Cîhan li dijî kiryarên Tirkiyeyê bê deng e

Gelê li ser sînorê Rojava li dijî kiryarên Tirkiyeyê bi bertek in. Têkildarî mijarê şêniyê Melek ê Dirbêsiyê Hesen El Erebo (70) diyar kir ku Tirkiye dijminê kurdan e û bi hovane êrîşî Rojava dike. El Erebo bi lêv kir ku artêşa tirk destûrê nade ku zeviyên xwe bikêlin. Leyla Xalib jî got ku zarokên wan ji ber gulebarana artêşa tirk nikarin razên û diyar kir ku ew tevî hemû êrîşan jî axa xwe bernadin. Hemîd Erebo jî got ku tevî hemû êrîşên Tirkiyeyê jî qada navneteweyî bê deng e. DIRBÊSIYÊ



## Serçeteyekî din jî hate kuştin

Balafirên şer li Idlibê li dijî wesayîta serçeteyê El Nusrayê yê bi navê Ebû Ibrahîm Tunisî êrîşek pêk anî û di encamê de hat kuştin. Di destpêka meha çileyê de jî balafirên bêmirov li dijî serçeteyên El Nusrayê êrîş pêk anîbûn û di encamê de serçeteyên payebilind ên bi navên Xetab Qehtanî, Ebû Omer Turkstanî û Ebû Museb El Dêrî yên El Nusrayê hatibûn kuştin. Di êrîşên 11'ê çileyê de jî di nav de serçete Seraqib û Merit Numan jî 12 çeteyên El Nusrayê hatibûn kuştin. EFRÎN



www.arsivakurdi.org

# Rojnameger di hedefê de ne

**Li Tirkiyeyê zextên li hemberî çapemenî û rojnamegeran zêdetir dibin. Duh dîsa rojnameger hatin girtin û binçavkirin û her wiha nûçegihanê New York Timesê hat dersînorkirin**



Ji 6 rojnagerên di 25'ê Kanûna 2016'an de hatin binçavkirin û 24 rojan di bin çavan de man Omer Çelik, Tunca Ogreten û Mahir Kanaat bi tawanbariya "Endamtiya rêxistinê" hatin girtin û her wiha rojnameger Derya Okatan, Metin Yoksu û Eray Sargin jî serbest hatin berdan.

Heyeta dadgehê ji bo rojnameger Omer Çelik wiha got: "Dema naverok û zêdebûna parvekirinên medyayê esas tên girtin, delîlên sûc ên xurt tên dîtin, mîqdara cezayê tê xwestin û gumanbariya ku sûcên hatine îsnatkirin û windakirina delîlan heye, tê qebûlkirin."

**DÎSA BINÇAV KIRIN**

Li navçeya Giyandîna Agiriyê nûçegihanê Ajansa Nûçeyan a Dîcleyê (DÎHA) ku bi biryarnameya KHK'ê hat girtin Abdullah Kaya, di serdegirtina malê de hat binçavkirin. Di mala ku serê sibê hat dorpêçkirin de 3 saetan lêgerîn hat kirin û piştre polîsan rojnameger Kaya ku hinceta binçavkirina wî nehat nîşandan, birin midûriyeta polîsan a navçeyê.

**DERSÎNOR KIRIN**

Rayedarên Tirkiye, nûçegihanê rojnameya New York Timesê Rod Nordland bêyî hincet nîşan bide dersînor kir. Rojnameger Nordland ku ji 150 welatan nûçeyan dinivîse, bi balafirê ji DYA'yê hat Tirkiyeyê û li balafirgeha Ataturk a Stenbolê daket. Nordland ji aliyê rayedarên balafirgehê ve hat rawestandin û destûr neda ku li Tirkiye bimîne ew ji balafirgehê paşve vegerandin. Rojnameya New York Times ev yek wek perçeyekî helwesta hikumetê ya li dijî medyayê nîşan da. Nordland diyar kir ku polîsên peywirdar gotiye ku navê wî di lîsteya Wezareta Karên Hundir de ye û destûr nadin ew bikeve Tirkiyeyê. *AMED*

## Ji bo rojnameger cezayê muebetê

Serdozgeriya Komarê ya Stenbolê piştî hewldana darbeya 15'ê Tîrmehê bi sûcdariya 'Rêveberiya rêxistina terorê' û "Endamtiya rêxistina çekdarî" 29 kes binçav kiribûn û 25 kes girtibûn. Dozger Murat Çaglak îdîanameya ji 196 rûpelan pêk tê, temam kir. Dozger di îdianameyê de der barê rojnameger Said Sefa de bi îdiaya "Tundiya cebîr bi kar aniye, hewl daye hikumeta komarê ji holê rake û peyvira wê asteng bike" û "Rêveberiya rêxistinê" cezayê muebbeta giran û ji 10 salan heta 15 salan cezayê girtîgehê xwest. Ji stranbêj Atilla Taş re jî bi îdiaya "Endamtiya rêxistina çekdar" jî ji 5 salan heta 10 salan ceza xwest. **STENBOL**

## Li dijî nirxên gel in

Partiya Herêmên Demokratîk (DBP), Hevseroka Giştî Sebahat Tuncel jî di nav de 4 hezar û 130 xebatkar, endam û rêveberên wê girtî ne. Ji van girtiyan 74 kes hevşaredar in û her wiha 62 şaredariyên wê jî bi tayînkirinên qeyûman hatine desteserkirin.

Piştî qeyûm hatine tayînkirin heta niha gelek biryar dane û ev biryarên wan rastî bertekan tên. Qeyûmên hatine tayînkirin; tabelayên şaredariyan ên pirzimanî, peyker, Bîrdariya Roboskê rakirin, xebatên jinan û yên çandî dan rawestandin û her wiha gelek karker jî ji kar derxistin. Alîgirê hevserokatiya DBP'ê Mehmet Arslan dest nîşan kir ku îktîdara ku bi hilbijartinê bi dest nexist, niha bi rêya qeyûman, bi darê zorê, bi derhiqûqiyan dixwaze bi dest bixe. Arslan wiha axivî: "Qeyûmên tayînî şaredariyên me hatine kirin, ji roja hatine ser kar heta niha îcraatên wan ên ewil ew e ku, jiholêrakirin û astengkirina xebatên jinan û çandê ye. Ji bo nirxên manewî yên Kurdistanê ji holê rakin tev digerin. Ev li dijî nirxên civakî û çandî yên Kurdistanê êrîş e. Ev rewş qethiyen nayê qebûlkirin." *AMED*

# Bi dehan kes hatin binçavkirin



Li bajarên Edene, Amed, Hatay, Manîsa û Bursayê polîsan bi ser gelek navnîşanan de girt. Polîsan di serdegirtinan de endam û rêveberên HDP, EMEP, SYKP, ESP, ÎHD, Egitim-Senê jî di nav de gelek kes hatin binçavkirin. Li Manîsayê 5 kesên berê hatibûn binçavkirin, hatin girtin.

Polîsan li navçeyên Hatayê bi ser malên endam û rêveberên HDP, EMEP, SYKP, ÎHD, Egitim Senê de girt û gelek kes hatin binçavkirin. Kesên ku navê wan diyar bû wiha ne: Hevserokên HDP'a Hatayê Prz. Şukran Cabir Dag û Kerem Nalbant, rêvebera HDP'ê Dilek Yeral Dablan, Ali Lale, Neslihan Atanan, hevseroka HDP'ê Îskenderunê Ahmet Çagin, Medya Guzel, Nevzat Guzel, Selçuk Saglam, Aysel Eşiyok, Hulya Cengiz, Dogan Bozkurt, Nadia Ekinci, Suleyman Porku, Mehmet Însan, Şukriye Kortak, Îsmail Dogan, Reşat Kizilay, Fikret Pirinç, Melek Demir, Nihat Erarslan, Adnan Eryilmaz, Mehmet Karlıdag, endamê Komeleya Alevî Bektaşî Sultan Başaran, Abidin Bakîr, serokê şaxa ÎHD'ê Coşkun Selçuk, rêveberê EMEP'ê Yusuf Gulşen, Mevlut Bulgur, endamên Egitim Senê Îlhan Kılınç, Gulizar Çay, Nidal Çay, rêveberê SYKP'ê Talat Oruç, Tuncay Yilmaz û Ali Karasu. Kesên hatin binçavkirin birin Midûriyeta Polisan a Samandagê.

Li navçeya Seyhanê ya Edeneyê jî polîsan bi ser gelek malan de girt. Hat zanîn ku gelek kes hatin binçavkirin. Kesên hatin binçavkirin birin Midûriyeta Polîsan a Seyhanê.

Li Amedê endamên ESP û SGDF'ê Beren Atici, Umît Tekîn, Huseyîn Akyuz û Ahmet Cengîz bi lêdanê hatin binçavkirin.

Li navçeya Turgutlu ya Manîsayê jî kesên di 24'ê Kanûnê de hatibûn binçavkirin, hatin girtin. Kesên bi navê Ersin Yaşar, Sabir Guler, Maşallah Temel, Vahap Çelik û Memduh Dineklî bi hinceta "propagandaya rêxistinê kiriye" hatin girtin. Li Bursayê jî bi hinceta medyaya civakî14 kes hatin binçavkirin. 14 kesên hatin binçavkirin birin Midûriyeta Polîsan a Bursayê. *DÎHABER*




# KESK'ê rapora îhlalê aşkera kir

Konfederasyona Sendîkayên Kedkarên Cemaweriyê (KESK), rapora îhlalên mafên sendîkayî ya di navbera 1'ê çile û 31'ê kanûna 2016'an de aşkera kir.

KESK'ê li Navenda Giştî ya KESK'ê civîna çapemeniyê pêk anî û rapor aşkera kir. Di civînê de Endama Hiqûqê ya KESK'ê û Sekretera Têkiliyên Navneteweyî Fatma Çetintaş daxuyanî da. Çetintaş diyar kir ku piştî hewldana darbeya 15'ê tîrmehê zext û binpêkirina mafan ji serdema darbeya 12'ê Îlonê gelekî zêdetir bûye. KESK'ê di raporê de diyar kir ku 2 hezar û 522 endamên wan hatin îxrackirin û 71 kes hatin girtin. KESK'ê da zanîn ku gelek endamên wan sirgûn bûne û rastî zextan hatine.

Çetintaş da zanîn ku bi deh hezaran kedkarên cemaweriyê bê kar hiştin û bi malbatên wan re li kolanan hatine hiştin û mehkumî birçîbûnê hatine kirin û wiha got: "Em li dijî hikumeta AK Partiyê banga têkoşînê dikin. Konfederasyona me KESK ji ber ku ne tenê ji bo endamên xwe ji bo hemû kedkaran serî li ber tu îktîdaran netewand û têkoşîn meşand, di hedefa îktîdara AKP'ê de ye. Çi dibe bila bibe em ê têkoşîna xwe ya rewa û hiqûqî bilindtir bikin." *ENQERE*

www.arsivakurdi.org

www.arsivakurd.org



## 5 sal in nobedê digirin

Ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li bajarê Strasbourg ê Fransayê di 25'ê hezîrana 2012'an de li ber Konseya Ewropayê çalakiya nobeda azadiyê hat destpêkirin û 239 hefte ne bê navber çalakî dewam dike.

Vê hefteyê endamên Tevgera Jinên Kurd a Ewropayê (TJK-E) ku ji Holandayê hatibûn, nobed dewr girt. Şohret Tosun, Gulbahar Gîncî, Humeyra Yildirim û Hanim Şahîn li gel hewaya sar nobedê digirin. Humeyra Yildirim wiha got: "Kurd bêzar nebûn û bêzar nabin jî. Hê jî hemû kes li ber xwe didin. Ji bo azadiya Rêbertiya xwe hemû kes tên vê derê." Her wiha tecrîda li hemberî Ocalan tê meşandin li Stockholma Swêdê bi çalakiyê hat şermezarkirin. Çalakî ji aliyê TJK-E'yê ve hat orgnaîzekirin. STRASBOURG

## Li meclisê perdeya duyemîn



Li Tirkiyeyê ku di pêvajoya OHAL'ê de guhertinên makeqanûnê tora duyemîn duh li meclisa Tirkiyeyê dest pê kir. Bi taybet ji bo tûra duyemîn kesên dibêjin "erê" bi fikar in û tedbîr hatin girtin.

Paketa ku 18 madeyên wê di tora yekemîn de bi dengên AKP û MHP'ê derbas bû, dê qedera paketê tora duyemîn nîşan bike. Her çiqas made bi dengekê bilind ji tora yekemîn derbas bûn jî ger di tora duyemîn de ji 330 dengan kêmtir bistîne dê neyê qebûlkirin.

Paketa ku AKP bi israr dixwaze di meclisê re derbas bike û ji bo wan vegeriya ye "meseleya hebûn û tune bûnê" di tora duyemîn de jî hesabên zirav dikin. AKP û serokê Meclîsê yê MHP'ê Îsmaîl Kahraman û kesên bi wî re Serokwekîl Ahmet Aydin, dema dengên wan bên derxistin dê 354 kursî bimînin. Lê dema encamên dengdayîna tora yekemîn bê nirxandin, di serî de palamenterên ku dengê vale, derbasnedar û ret bikaranîn de ji aliyê AK Partî û MHP'ê ji 10 deng vala derketin. Ger ev valabûna dengan bigihe 20'î dê qanûna bingehîn ji bo herdu aliyan bikeve xeteriye.

Ger pêşnûme bi vî halê xwe pê qebûlkirin dê ji aliyê serokomar ve bê qebûlkirin û dê di nava 90 rojan de biçin referandumê. AKP ji bo dîroka referandumê hefteya yekemîn a nîsanê hesab dikin û ev jî nîşan dide ku dê pêşnûme demildest ji aliyê Erdogan ve bê qebûlkirin. Di heman demê de ev tê wateya dê di şertên OHAL'ê de pêşnûme bibinpêşberî gel û bi awayekî newekhevî bê dengdayîn.

Ger madeyên pêşnûme hemûyê, û pergala serokatiyê, bêkarhiştina meclisê û guhertinên veguhestina kesên di saziyên dadgehê de neyên qebûl kirin, ligel ku gefên hilbijartina pêşwext tên xwarin jî tê gotin dê herdu partî çûna hilbijartinan negirin berçavan. *ENQERE - DÎHABER*

# Têkoşînê geş bikin

**Sozdar Avesta diyar kir ku ew bi tu awayî agahiyê ji Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan wernagirin û bang li gelê kurd kir ku ji bo azadiya rêberê xwe tê bikoşin**

Endama Konseya Serokatiya Giştî ya KCK'ê Sozdar Avesta tev li bernameya Çira Welat ya Çira TV'yê bû û bersiv da pirsên rojnameger Sabriye Duman.



Sozdar Avesta bertek nîşanî tecrîdê da û wiha got: "Rêber Apo mîsogeriya jiyana bi hev re ye. Rêber Apo pira di navbera gelan de ye. Xwedîderketina civaka êzidî ya li Rêber Apo pir girîng e. Eger DAIŞ'ê encam nestan dibe, heke civaka êzidî ku îro bikaribe behsa tiştên pîroz bike, ev keda Rêber Apo ye."

Avesta diyar ku ew ji Ocalan agahî wernagirin û got ew ji rewşa wî bi fikar in. Avesta wiha pê de çû: "Tecrîda li ser Rêber Apo ev demek e dirêj berdewam dike û em bi ti şêwazî agahiyê ji Rêbertiya xwe nagirin. E jî fikar û gumanan zêde dike û gumanên giran bi me re çêdibin. Bila gelê me jî vê bizanibe; em ji tendiristiya Rêberê xwe, ji ewlekariya wî, ji şert û mercên ku ew tê dijî pir bi fikar in. Ji bo vê jî divê gelê me çalakiyên mezin li dar bixe û ji bo azadiya rêberê xwe divê têkoşînê geş bikin.

Avesta bi mebesta ku tecrîda li ser Rêber Apo were şikandin gelê ku di liv û tevgerê de bû, çalakiyên ku jinan pêşengtiya wê dikir silav kir û got: "Rêber Apo li rojavayê Kurdistanê ked daye niha jî gelê Rojava li vê kedê xwedî derdikeve. Li Şêx Meqsûd bi pêşengiya jinan girêva birçîbûnê dest pê kir, bi rojan berxwedan hate kirin, bi rengekî tund helwesta xwe nîşan dan, bi mebesta ku agahiyê ji Rêberiya xwe bigirin. Di nav şert û mercên şer de xwedîderketina li Rêbertiya xwe tiştekî pîroz e. Ez gelê Şêx Meqsûd bi rêzdarî silav dikim."

Avesta behsa salvagera komploya navneteweyî kir û got pûçkirina komployê bi azadiya Ocalan pêkan e û wiha axivî: "Em wek tevgera jinan azadiya xwe di şexsê Rêber Apo de dibînin. Azadiya Rêber Apo azadiya jinan e. Ji destpêka komployê û hetanî niha ji bo ku em bikarin bibin layiqî keda Rêber Apo, di hemû qadan de jinên Kurdistanê pêşengtiya têkoşînê kir û hê jî dikin. Çavkaniya me, hêza me, fikr û felsefeya Rêber Apo ye. Paradîgma û pergal ji hêla Rêber Apo ve hatiye pêşxistin. Ev pergal pergala jinan e. Pergal pergala wekheviyê ye. Ji bo vê jî xwedîderketina li Rêber Apo xwedîderketina li siberoja xwe, xwedî derketina li hebûna xwe ye. Divê li derdora Rêber Apo têkoşîn were geşkirin. Tevahiya jin, ciwan, rêxistinên sivîl bi giyanekî cangorî divê ji bo şermezarkirina 15'ê Sibatê li ser piyan bin. Divê CPT rojek beriya rojekê careke dî biçe Rêber Apo ziyaret bike û têkildarî Rêber Apo daxuyaniyê bide." *BEHDÎNAN - ANF*

## Şengal siberoja êzidiyan e

**AVESTA DA ZANÎN** ku navenda siberoja civaka êzidî Şengal e û wiha got: "Civaka êzidî Şengalê ji bo xwe wek cihekî pîroz dibîne. Hebûna xwe li vir daye destpêkirin, li vir berdewam kiriye. Dîn, erka xwe, rê û resmê xwe, civakîbûyîna xwe, çanda xwe di Şengalê de parastiye û li Şengalê ew bi pêş ve biriye. Careke dî bi vî rengî lê nêzîkîtêdayîn û xwedîderketina bi vî rengî berî her kesî erka civaka êzidî bi xwe ye."

## Ji wekîlan re name şandin

Platforma ji bo Ked û Demokrasiyê Hêza Yekîtiyê, derbarê hevdîtinên qanûna bingehîn û tora 2'yemîn de ji bo name ji parlamenteran re bişînin li ber deriyê Lîseya Galatasarayê hatin cem hev.

Hêzên Ked û Demokrasiyê, ji hemû parlamenterên li Meclîsê ne re ji bo laîklîk, demokrasî û destkeftiyên dewleta civakî bên parstin ji bo dengê "Na" bikarbînin name şandin. Hêzên Ked û Demokrasiyê yên Edeneyê ji bo parlamenterên li Meclîsê dengê "Na" bikarbînin li Postexaneya Cemalpaşayê ji wan re name şandin. Beriya name bên şandin Serokê Egîtîm Sena Edeneyê Ahmet Karagoz, bang li parlamenteran kir ku ji bo a zanîn ku laîklîk, demokrasî û destkeftiyên dewleta civakî bên parstin dengê "Na" bi kar bînin. *STENBOL - EDENE*



## Ji hêzên demokrasiyê hişyarî

Hêzên Ked û Demokrasiyê yên Îzmîrê der barê guhertinên qanûna bingehîn yên li Meclisê û dengdayîna tora duyemîn de li Navenda Çandê ya Turkan Saylanê civînek çapemeniyê li darxist.

Di civîna ku pankarta "Ji bo Demokrasî û Aştiya Civakê guh bidin vî dengî û bêjin Na" hat vekirin de nûnerên partiyên siyasî û saziyên civaka sivîl tevlî bûn. Berdevkê Lijneya Koordînasyona TMMOB'ê yê bajar Melîh Yalçin daxuyanî xwend. Yalçin, bang li hemû parlamenterên li Meclîsê kirin ku bêjin "Na" û hişyariya "dibe ku sibê direng be" kirin. *ÎZMÎR*




## Doz li dijî hiqûqê ye

69'emîn rûniştina "Doza Sereke ya KCK'ê" ku Hevserokên KCD'ê Hatip Dicle, Leyla Guven, Hevserokê Giştî yê DBP'ê Kamuran Yuksek, Hevşaredarên Girtî Firat Anlı û Ahmet Turk jî di nav de 154 siyasetmedarên kurd tên darizandin, li 6'emîn Dadgeha Cezayên Giran a Amedê hat dîtin.

Di rûniştinê de siyasetmedarên kurd Veysi Akar û parêzerê wî amade bû. Akar, parastin kir û anî ziman ku ew endamê DTP'ê yê Sûrê ye û ev yek hatiye guhertin wekî endamê KCK'ê tê darizandin. Akar îdiayên der barê xwe de red kir û beraata xwe xwest. Parêzerê Akar diyar kir ku berdewamkirina vê dozê bi hiqûqê nayê vegotin û li dijî hiqûqê ye. *AMED*



# Deynê Tirkiyeyê bû 403 MILYAR DOLAR

**AKP dixwaze bi şerê psîkolojîk têkçûna xwe ya aborî ji gelên Tirkiyeyê veşêre. AKP'ê bi deynkirina pereyan hin deynên din vedişartin. Kurt û kurmancî 'IMF'yek çû, 3 IMF'yên din hatin'. Deynê Tirkiyeyê 3 qat zêdetir bû**

NAVENDA NÛÇEYAN




Li Tirkiye êdî her tişt bi argumanên şerê psîkolojîk tê berovajîkirin. Di vê çarçoveyê de hedef raya giştî ya Tirkiyeyê ye. Tirkiyeya ku aboriya wê di pêvajoya çareseriyê de her roj mezin dibû piştî bidawîkirina pêvajoyê û pêşxistina polîtîkayên şer êdî lawaz dibe. Di nava 3 mehan de pereyê tirkan li hemberî dolar û euro heliya û bê qîmet bû.

Li gel qelsî û lawaziyê jî Tirkiye li hêlekê êrîşî Sûriyeyê dike û li hêla din jî dixwaze dagirkirina xwe ya Iraqê mayînde bike. Bêgûman bêyî aboriyê çek nayên kirîn û şer jî nayê kirin. Kerem kin vêca ji vir vêxin.

***Dê krîza aborî, ya siyasî jî bi xwe re bîne***

Xuya ye ku fatureya şer jî dê li şûna berpirsiyarê siyasî ango hikumeta AKP'ê dê ji pişta gel bê derxistin û her roj bi bilinbûna dolar û euro ji niha ve tê derxistin jî. Li gel ku niha li ber deriyê Tirkiyeyê krîzeke aborî heye jî tê payîn ku di demeke nêz de li Tirkiyeyê krîzeke siyasî jî rû bide. Helbet ev gotin ne bê bingeh e, em ê binê vê gotinê bi lêkolîn û encaman li ber çavan raxin.

***Spekulasyonên Erdogan û Davutoglu***

Beriya niha Serokomar Tayîp Erdogan bi daxuyaniyekê aşkera kir ku wan di serdema hikumeta AKP'ê de hemû deynên IMF'ê dane, her wiha gotibû ku niha jî IMF bi deyn 5 milyar dolaran ji Tirkiyeyê dixwaze û pesnên vê yekê wî û serokwezîrê wê demê Ahmet Davutoglu li hemû platforman didan.

***Ji roja ku AKP bû hikumet û heta niha rewş çi bû?***

Hikumeta AKP'ê dema di sala 2002'yan de hat ser desthilatdariyê 129 milyar dolar deynê Tirkiyeyê hebû. Di nava 16 salan de li gel ku hikumeta AKP'ê bi dehan saziyên dewletê arîze kirin (firotin) û bi milyar dolaran pere ji vê arîzekirinê bi dest xist jî deynê Tirkiyeyê niha derketiye 403 milyar dolaran. Tirkiye herî zêde di serdema hikumeta AKP'ê de bû deyndarê saziyên aborî yên cîhanê. Di serdema hikumetên AKP'ê de bi temamî 273 milyar dolar deyn hat kirin. Tenê ji saziyên dewletên biyanî 25 milyar dolar deyn hat kirin. Lê mixabin li gel arîzekirina saziyên dewletê jî deynê Tirkiyeyê neqediya û her wiha tê îdiakirin ku Tirkiye deynê IMF'ê jî bi pereyên ku ji dewletên biyanî deyn kirine, girtiye.

Belê rast e; deynê IMF'ê li Tirkiyeyê tune ye lê di rastiyê xwe de Tirkiye niha deyndarê Bankaya Cîhanê, Bankaya Razemeniyê ya Ewropayê û Bankaya Pêşxistina Îmarê ya Navneteweyî ye.

***Pereyên ku hatin deynkirin***

Ango di esasê xwe de li holê xapandineke mezin heye û ev yek jî di çarçoveya şerê psîkolojîk ê li hemberî raya giştî ya Tirkiyeyê de tê bikaranîn.

Deynê Bankaya Cîhanê û Bankaya Razemeniyê ya Ewropayê ku li Tirkiyeyê ye, ji 16 milyar dolaran derbas bû.

Di nava 3 salên dawîn de Tirkiye ji Bankaya Cîhanê 9 milyar û 200 milyon dolar pere deyn kir. Niha jî ji Bankaya Cîhanê 10 milyar dolaran bi deyn dixwaze.

***Muşteriyê bankayên cihanî***

Dîsa sala par jî Tirkiyeyê ji Bankaya Razemeniyê ya Ewropayê 2 milyar û 300 milyon euro pere deyn kir.

Her wiha niha jî 2 milyar û 500 hezar euro pere bi deyn ji heman bankayê dixwaze.

Li gel van bankayan Tirkiye 6'mîn muşteriyê pereyên bideyn ê Bankaya Pêşxistina Îmarê ya Navneteweyî ye.

Xuya ye ku AKP'ê deynê IMF'ê qedand lê li şûna wê bû deyndarê 3 bankayên cîhanê. Kurt û kurmancî 'IMF'yek çû, 3 IMF hatin'. Deynê Tirkiyeyê kêm nebû berovajî vê yekê 3 qat zêdetir bû.

***Aborî dê biçûktir bibe***

Divê mirov çend nîşaneyên din jî pêşkêş bike bê ka xetereya li pêş aboriya Tirkiyeyê çi qas mezin bûye. Herî dawî Bankaya Cîhanê ji ber nezelaliya siyasî ya li Tirkiyeyê rêjeya mezinahiya Tirkiyeyê ji sedî 3,5'an daxist ji sedî 3'yan.

Di heman rojê de Morgan Stanley jî rêjeyên xwe yên 2016-2018'an aşkera kirin û texmînên xwe yên der barê mezinbûna Tirkiyeyê de daxistin.

***Encamên aboriya Tirkiyeyê***

Morgan Stanley jî rêjeya xwe ya bo mezinahiya Tirkiyeyê ji sedî 2.7'an daxist ji sedî 2.2'yan. Ji bo sala 2017'an jî ji sedî 2.6'an daxist sedî 2.3'yan. Li gorî van encaman tê xuyakirin ku dê aboriya Tirkiyeyê di sala 2017'an de li şûna mezin bibe, hêj biçûktir bibe.

Pereyê rezervê yê di destê Bankaya Navendî ya Tirkiyeyê de 35 milyar dolar e. Ev jî bi tenê têra îthalata 2 mehan dike. Lê belê divê Tirkiye heta meha mijdarê 163 milyar dolar deynê derve bide. Dema ku ferqa carî (îthalat û îxracat) 53.3 milyar dolar jî lê bê zêdekirin, deynê ku di sala 2017'an de divê bê dayîn dibe 213 milyar dolar.

Hesabê malê û sûkê carinan li hev nagirin. Gelo dibe ku hesabê hikumeta AKP'ê yê ku beriya niha ji bo 2023'yan kiribû li hev dernekeve?

# Tevlîbûna Astanayê qebûlkirina dagirkeriya Tirkiyeyê ye

EKREM BEREKAT



Beşeke mezin ji şêniyên Sûriyeyê û hin hêzên kurd ji bo çareserkirina aloziya Sûriyeyê gelek hêvî li ser civîna Astanayê ku tê payîn di 23'yê çileyê de bê lidarxistin, danîne. Lê ev rastiya vê civînê û armancên hêzên sponsoriya wê dikin, nizanin.

***Ne pêkan e ku çareserî pêk pê***

Hin hêzên demokratîk dibînin ku hîna zû ye ku nîqaş li ser çareserkirina aloziya Sûriyeyê li gorî biryara Konseya Ewlekariyê ya 2254 bê kirin. Vê yekê jî dispêrin gelek sedeman ku hin ji wan, hebûna dagirkeriya Tirkiyeyê û Îranê ya li qada siyasî û leşkerî ya Sûriyeyê ku yek ji van civîna Astanayê amade dike da ku li Cenevreyê têk bibe û ya din jî amadekariyên wê dike. Her wiha hebûna bermahiyên çeteyên DAIŞ, El Nusra û komên alîgirên wan li ser axa Sûriyeyê ye.

***Astana civîna parvekirina Sûriyeyê ye***

Dema mirov li tabloya şerê Sûriyeyê û bi taybet rûdanên dawîn piştî dagirkirina Tirkiyeyê ji bajarê Cerablus heya nêzî Babê û derxistina komên muxalefetê ji Helebê temaşe dike, dikare tê bigihîje ku civîna Astanayê civîneke Tirkiye-Rûsyayê ya ji bo parvekirina axa Sûriyeyê di navbera her du hêzan de ye.

***Şertên Rûsyayê diyar in***

Rûsya armanc dike ku çeteyên nêzî Tirkiyeyê ji hawirdora Şamê û Xûtayê, Humis, Deria û Idlibê derxe. Her wiha dixwaze bi rêya vê civînê Tirkiye bi awayekî fermî îtîraf bike ku herêmên Qirim a Ukranyayê girêdayî Rûsyayê ye.

***Tirkiye dixwaze çi bike?***

Tirkiye jî niha hewl dide ji aloziya Sûriyê bireve û avê vegerîne rêçên wê yên beriya aloziya Sûriyeyê. Nexasim daxuyaniyên rayedarên hikumeta AKP'ê vê destnîşan dikin. Yek ji van Cîgirê Serokwezîrê Tirkiyeyê Nûreddîn Canîklî ku di rojên pêş de ew ê têkiliyên aborî di navbera Tirkiye û Sûriyeyê de geş bibin û ev têkilî dê fermî û gelêrî be. Her wiha armanc dike ku bi vê yekê re hemwext Hîzbullahê ji Sûriyeyê derxe.

***Tevlibûn tê çi wateyê?***

Dema mirov li daxuyaniyên her du aliyan ango Rûsya û Tirkiyeyê dinêre, tê xuyakirin ku civîna Astanayê dê tenê civîneke berjewendiyan be. Her wiha dema mirov bala xwe bide hevdîtinên dîplomasî û navên şandeyên ku dê beşdarî civîna Astanayê bibin û dûrî atîfetê li tabloya navneteweyî temaşe bike, diyar dibe ku ne pêkan e hêzên demokratîk ên bakurê Sûriyeyê tev li vê civînê bibin û bi taybet ku sponsorê sereke yê vê civînê aliyê Tirkiyeya dagirker bi xwe ye. Ger hêzên bakurê Sûriyeyê beşdar bibin jî tê wateya ku ew dagirkirina Tirkiyeyê ji axa bakurê Sûriyeyê re erê dikin û di vê pêvajoyê de ku çarenûsa xwe diyar dikin, ji bo Tirkiyeyê dev ji pîvanên xwe berdidin û temenê dagirkeriya Tirkiyeyê li Sûriyeyê dirêj dikin.

***Daxwazên hêzên demokratîk***

Li aliyê din jixwe hêzên demokratîk ên bakurê Sûriyeyê xwediyên rasteqîn ên maf, ax û hêzê ne, heke ev beşdarî civîneke wiha nebûn tu zirareke xwe tune ye. Her wiha ger ev hêz hatin vexwendin jî divê mercê wan ê beşdarbûna danûstandinan ew be ku dagirkeriya Tirkiyeyê ji axa bakurê Sûriyeyê derkeve. Her wiha tezmînatên navneteweyî bên dayîn ku Tirkiye êdî zêdegaviyan li hemberî vê herêmê neke û bi awayekî fermî belgeya siyasî ya civîna Rimêlanê wek belgeyeke nîqaş û çareseriya aloziyê bê dîtin û qebûlkirin.

## Li Qamişlo dîwarên dibistanan tên neqişandin

**HEVGIRTINA REWŞENBÎRÊN** Rojavayê Kurdistanê (HRRK) bi dirûşma "Kirasê Bûkê 7 Reng e" kampanyaya xweşikkirina dîwarên dibistanan li Qamişlo da destpêkirin. HRRK dixwaze dîwarên dibistanan xweşik bin û ji bo vê yekê kampanyayek daye destpêkirin. Li gorî kampanyayê 20'ê mehê saet 14'an de dê ji navenda HRRK'ê li Qamişlo dest pê bikin û dîwarên dibistanan boyax bikin. Li gorî kampanyayê dê 200 metre dirêj û 2 metre pan dîwarên dibistanan bêne xemilandin. Ev kampanya wek piştgiriyeke ji bo fêrkirina zimanê kurdî ye ku cara yekê ye li Rojava û li Sûriyê zarokên kurd di dibistanan de zimanê xwe yê dayikê fêr dibin. **QAMIŞLO**




## Bavê wê nivîsand wê jî kir stran



Keça hunermendê navdar Nasir Rezazî, Dilniya Rezazî, helbesteke bavê xwe kire stran. Dilniya Rezazî destnîşan kir ku ew di amadehiya çêkirina klîbekê de ye ji bo vê awazê. Keça Nasir Rezazî û Merziye Ferîqî beriya vê strana xwe, mohra xwe li hin xabatên din jî dabû. Di sala 2005'an de dayika Dilniya koça dawîn kiribû û Dilniya jî ji bo diya xwe stranek gotibû û bi vê stranê navdar bûbû. Her wiha albuma ku ji diya wê nîvco mabû temam kir û pêşkêşî hezkiriyên xwe kiribû. **HEWLÊR**

## Mem û Zînê li Amerîkayê deng veda



Pêşangeha hunermendê kurd Ahmet Guneştekin bi navê "Rêwîtiya ji Rojhilat ber bi Rojava ve" li bajarê New Yorka Amerîkayê di lîsteya hunerê de sereke ye. Malpera herî girîng a hunerî ya cîhanî Artnet News pêşangeha Ahmet Guneştekîn di lîsteya huneriyê de wek çalakiya sereke pêşniyar dike. Di pêşangehê de destanên kurdî yên wekî "Bêgunehiya Mem û Zînê" û "Şahmaran" cih digirin. Li ser bilboardên mezin ên Meydana Timesê danasîna pêşangehê tê kirin. Her wiha medyaya Amerîkayê eleqeyek girîng dabû pêşangeha bi navê "Konstantinniye" ya li Stenbolê ku ji ber bertekan hatibû rakirin. **NEW YORK**

## PEN'a Kurd ji bo Cîhanferd dest bi çalakiyan dike



Nivîskarê kurd ê rojhilatî Jiyar Cîhanferd, ji 3'yê çileyê ve li gel hevalê xwe yê lêkolîner Hasan Belede li Mêrdînê hat binçavkirin. Jiyar ji bo çapkirina pirtûkên xwe hatiye Amedê û Hasan jî xwestiye serî li beşa kurdolojiyê ya li Zanîngeha Artukluyê bide. Lê dema ew li Mêrdînê li kafeyekê rûniştine ji aliyê polîsan ve tên binçavkirin. Şexmûs Sefer serokê bere yê PEN'a Kurd destnîşan kir ku Jiyar û Hasan, beriya derbasî Mêrdînê bibin, serdana wî kirine. Sefer anî ziman ku PEN'a Kurd ji bo ku rewşa Jiyar Cîhanferd hîn bibe û ji bo ku ew bên berdan bi PEN'a Navneteweyî re dê peywendiyê deynin. **AMED**

# Bi wêneyan xwepêşandana Seyîdsadiq



*Pêşangeheke wêneyên xwepêşendanên Seyîdsadiqê ya taybet ji aliyê Saziya Parastina Ragihandinê ve li Silêmaniyê hate vekirin.*

*Di pêşangehê de wêneyên hêzên ewlekariyê yên di wê xwepêşandanê de kişandibûn jî tên nîşandan*







Xwepêşandanên Seyîdsadiqê ku di 1'ê sibata 2014'an de li dijî nebûna xizmetguzariyê di wê navçeyê de dest pê kiribû û bi qasî 3 rojan jî berdewam kiribû. Di wan xwepêşandanan de ciwanek ji aliyê hêzên asayîşê ve hatibû kuştin ku navê wî Biryar Hesen bû.

Saziya Parastina Ragihandinê bi alîkariya Beşa Teknîkî ya Ragihandina Koleja Polîteknîk a Silêmaniyê pêşangeheke hevbeş a wêneyan pêşkêş kir. Li navenda zankoya Polîteknîk a Silêmaniyê li taxa Çarçirayê pêşangeh bi 45 wêneyan hate vekirin. Tevahiya wêneyan li ser demên xwepêşandanê bûn.

**ALIYAN NÎŞAN DIDE**

Dana Omer Berzencî yek ji wan wênekêşên ku di pêşangehê de wêneyê wî hatiye nîşandan, li ser pêşangehê axivî û got: "Me hewl da ku di vê pêşangehê de hevsengiyekê, di navbera qurbaniyan û hêzên ewlekariyê de biparêzin. Min wêneyê her du aliyan jî daye nîşandan. Ev pêşangeh ji bo bîranîna şehîd Biryar e ku dosyaya wî niha li dadgehê ye. Her wiha me hewl daye ku peyama ragihandinê di vir de bidin."

Ehmed Mestekanî jî yek ji wan kesan e ku wêneyên wî di pêşangehê de cih digirin û bi xwe jî xelkê navçeya Seyîdsadiq e, der barê pêşangehê de wiha got: "Em dixwazin bi vê pêşangehê rastiya navçeya xwe nîşanî hemû kesan bidin. Her wiha em dixwazin bibêjin ku tenê armanca me xizmetkirin e, ne paşguhkirin e. Ez tiştekî ji hikumetê naxwazim. Ji ber ku ez dizanim ku sûdeke wan li me nabe."

**HER WÊNE PEYAMEK E**

Wênekêşeke din jî bi navê Helo Çebarî ye ku bi wêneyên xwe beşdarî pêşangehê bû jî der barê peyama xwe û pêşangehê de wiha axivî: "Her wêneyek peyameke xwe ya taybet heye. Wêne behsa wan her 3 rojên xwepêşandanê dike. Me xwest peyama çawa nêzî welatiyên xwe bûne, nîşanî wan bidin."

Xwişka Biryar Hesen jî di pêşangehê de amade bû. Lê ji ber bandora hestyar a di pêşangehê de çêbû, nekarî der barê birayê xwe de ji çapemeniyê re biaxive. Li ser vê yekê Helo Çebarî da zanîn ku xwişka Biryar Hesen ji ber wêneyên pêşangehê gelekî hestyar bû, ji lewma nekarî biaxive. ***SILÊMANÎ - ROJNEWS***

# Şano li kolanan tê pêşkêşkirin



Navenda Çand û Hunerê ya Baqî Xido ya Kobanê dest bi hemleya pêşkêşkirina şanoyan li kolanan kir. Di hemleyê de Koma Şanoya Şehîd Yekta lîstik pêşkêş kirin.

Bi dehan welatiyên li kolanan li şanoyan temaşe kir. Di çarçoveya hemleyê de 5 şano balê dikêşin ser mijarên çandî, civakî û rewşa gel a niha. Yek ji şanoyan ku li Meydana Aştî hate pêşandan, li ser berxwedan û serdana malbatê ya goristanê dema nasnameya kurê wan ê şehîd tê ragihandin bû. Gelê Kobanê bi dilgermî pêşwaziya hemleyê kir û kom dê hemleya xwe bidomîne û dê şanoyên xwe li taxên din jî pêşkêş bikin. ***KOBANÊ - ANHA***

## Dê perde ji bo 'Jinê' bê vekirin



Koma Şanoyê ya Uç Noktayê, ji bo ku balê bikêşe ser cinayetên jinan ên di demên dawîn de her ku diçe zêde dibin, amadekariyên pêşandana lîstika bi navê "Kadin"ê (Jin) dike.

Di 31'ê çileyê de li Sahneya Karga ya Kadikoyê lîstik dê bê nîşandan. Lîstikê tiştên ku hatine serê jina bi navê Yeşîm kiriye mijar û di ser vê karekterê re dubare di civakê de cihê jinan dide der. Karektera Yeşîm li hemberî mijarên wekî bi kê re dijî, saet di çendan de hatiye malê, di çendan de derketiye û kî hatine malê û hwd. bi tena serê xwe tê dikoşe.

Di lîstika "Kadin" a 7 kesî de ku senaryoya wê ji aliyê Dilan Ayata ve hatiye nivîsandin, Ezgî Ozfen (23), karektera Yeşîmê dilîze. Ozfen diyar kir ku dê her kes xwe di lîstikê de bibîne.

Gorkem Aydin (23) ê ku dê di lîstikê de karekterê bi navê Emre bilîze jî got ku ev 2 sal e wan Koma Şanoyê ya Uç Noktayê ava kiriye. Aydin wiha behsa lîstikê kir: "Mixabin li welatê me cinayetên jinan zêde ne. Me xwest em bi vê lîstikê balê bikêşin ser pirsgirêkên civakî." **STENBOL - DÎHABER**

## Ji Şanoya Agonê 3 lîstikên nû

Şanoya Agonê ya ji 2011'an ve li Mêrsînê bi awayekî çalak faaliyetên xwe dimeşîne, hefta çûyî lîstika bi navê 444 a pergala navenda bangawaziyê vedibêje, nîşan da û piştî vê lîstikê dê 3 lîstikên din jî bide nîşandan. Ji endamên Şanoya Agonê Mustafa Çavuş anî ziman ku, ji bo sala 2017'an amadekariyên lîstikên wan ên bi navê Kopekler (Kûçik), Hiç Kimsenin Oykusu (Ne Çîroka Tu Kesî) û Tek Kişilik Cinayet (Cinayeta Yekkesî) bi dawî bûne.

Çavuş anî ziman ku Komeleya Şanoyê ya Mêrsînê îsal 21 lîstikên şanoyê dane nîşandan, ji van lîstikan 4 jê aîdî Agonê ne û got ku ji van lîstikan lîstika 444 wan nîşan daye.

**'KÛÇIK'**

Çavuş diyar kir ku di lîstika Kopekler (Kûçik) de kesê hêz di dest de ye dê hêzê çawa bi kar bîne vedibêje û wiha got: "Ne girîng e di dest kê de ye. Têkildarî xwezaya mirovan e. A rast hem balê dikişîne ser paşerojê hem jî îro." Çavuş dest nîşan kir ku ew di lîstika Ne Çîroka Tu Kesî de balê dikişînin ser mirovahiyê û wiha got: "Dema du leşkerên dijmin ji şer vedigerin, di heman kompartimanê de rastî hev tên, pêşî hev nas nakin. Lê piştî çend sohbetan hev nas dikin û bi kîn û nefretê nêzî hev dibin. Di ser vê re a rast em vedibêjin ku yên dijminahiyê diafirînin mirov bi xwe ne."



Çavuş got ku di lîstika Cinayeta Yekkesî de li dor lîstikeke ku mirov karekterên di hundirê xwe de kuştine diçe û tê û wiha got: "Di navbera kesê ku bandora civakê lê bûyî û kesê ku dixwaze bibe kes de pêwendiyê datîne û ew kes dizane ku xwe li gorî civakê dîzayn dike." **MÊRSÎN - DÎHABER**

Rojeva Medya
19 Çele 2017 Panşeme

# Hîkayeyêka xoverdayîşî: ŞÊXMEQSUD

Sûrîye de wexto ke pêla serewedaritişê şaran hetê menfîetperestan ra xeta xo ra ame vetiş û krîz dest pêkerd, cayê ke bîyî merkezê krîzî nînan ra yewe zî bajarê Helebî bî. Hema vaje heme hêzê herême û mîyanneteweyî planê xo tîya de ceribnayênê.

Heme bazarî ser na herême de virazîyayêne, cok ra heme polîtîkayî hetê grûbê cîyacîyayan yê çeteyan ra ameyî ceribnayîş û tîya de şer qet nêvindet. 5 serran ra dima herême ser ro mabênê Tirkîya, Rûsya, Îran û rejîmê Baasî yê Sûrîye de pêameyîşêk ame viraştene û heme çeteyî bajarî ra ameyî vetene.





**Mîyanê 5 serranê krîzê Sûrîye de yê ke tewr derg tede xoverdayîş dewam kerd Şêxmeqsud bî. Wexto ke bajar bi temamî rijîyayêne zî ewja de cuyayîşêko newe ameyêne awankerdiş**

Bajar teslîmê rejîmî ame kerdene û dima ra seba ameyoxa bajarî munaqeşeyî ameyî kerdene.

Semedo ke heme bawerî û netewe bajar de cuyenî, fikrêko sey 'rengê sîstemê Helebî do rengê sîstemê ameyoxa Sûrîye zî dîyar bikero' vejîyeno aver. Cok ra her hêzêk hewl dano ke planê xo bierzo dewre.

Tam na nuqta de reyna Heleb de rengêko cîyayêr ke vajo 'çareserî ez a' xo nîşan dano. No reng zî taxa Şêxmeqsud a.

Labelê çira Şêxmeqsud? Hîkayeya 10 serran ya na taxe cewabê nê persî ya. Na taxa ke bitaybetî 5 serranê peyênan de xoverdayîşê xo bêmabên domna, peynî de serkewt û cuyeyêka newe awan kerde.

### HÎKAYEYA MUNITIŞÎ

Taxa Şêxmeqsudî ser girêko gird ke hetê vakurê bajarê Helebî de yo, ewja de ameya awan kerdene. Tîya cayo ke tewr berz yê Helebî yo û hakimê heme cayan o. Ê girî ra vanê 'Cebel Seydê (Koyê Rêzdarî)'. Nameyê nê girî ser o xeylê çîyî ameyî vatiş. Labelê nê vatişan ra yê ke tewr zaf vejîyeno aver; no yo û nameyê ci zî bawerîya Xirîstîyanî ra ameyo. Herême de dêrêk estbîyo û vatişê 'Rêzdarê'zî seba Hz. Meryeme ameyo vatiş.

Taxa Şêxmeqsudo ke keweno rojhelatê taxa Eşrefîye, eynî wextî de taxa tewr gird ya bajarî ya. Taxe ser 4 hezar metrekare erdî de ameya awan kerdene û goreyê hûmartişo ke serra 2010 de amebî viraştene, 800 hezar kesî taxe ronîşenî. Taxe de ereb, kurd, tirkmen û ermenî cuyenî, labelê înan ra yê zafane kurd î. Kurdî seserra 20. de herêmê Efrîn, Kobanê û Şehba ra ameyî taxe, înan ra tayê zî demo verên ra taxe de bica bîyî.

### GÊRAYÎŞÊ AZADÎ

Şarê taxe yê kurd zafane zext, neheqî, zulm, kiştiş, talan û înkarî ver koç kerdî û ameyî taxe de bica bîyî. Bi vatişêko bîn xeylê dej û êşî antî û her tim cuya azade gêrayî. Cok ra neheqîyan qebul nêkerdî û tîya de zî xoverdayîş û gêrayîşê xo yê azadîye domnayî.

Şarê Şêxmeqsudî reaksîyonê xo yo tewr gird vera Komploya Mîyanneteweyî ke netîceyê ci de Rayberê Şarê Kurd Abdullah Ocalan amebî tewqîfkerdiş de nîşan dabî.15ê Sibata 2001 de bi hezaran kesan herêma Şiqêfî ya ke giredayeyê taxa Şêxmeqsudî ya, ewja de dest bi meşîyayîşî kerdbî û heta cadeyê 20an ameyî. Wexto ke çalakî dewam kerdêne, hêzê rejîmî hêrişî çalakvanan kerdî û bi desan kesî ameyî tepiştiş.

### ÇALAKÎYÊ 2004Î

Wexto ke hêzê rejîmî 12ê adara 2004 de bajarê Qamişlo de qirkerdiş viraşt û şarê Rojawanî sere wedarnayî, şarê taxa Eşrefîye û Şêxmeqsudî zî vera rejîmî de sere wedarnayî. Hêzê rejîmî tarzê xo yê wehşetî tîya de zî meşnayî û hewteyêk ra zêde qedexeyê tebervejîyayîşî îlan kerdî. Reyna nêweşxane û heme merkezanê weşîye padayî û nêverdayî ke doktorî şêrî nêweşanê xo ser de. Eynî wextî de netîceyê eştişê keyeyan ser de bi seyan ciwanê kurdî ameyî tepiştiş û raştê îşkenceyî ameyî.

Labelê şarî sere nêrona û 16ê adare de her 2 taxan ra bi seyan kesî nizdîyê herêma Sêkoşeya Taxa Eşrefîye de çalakîyêk viraştî. Na rey hêzê rejîmî bi sîlehan hêriş kerdî û 2 ciwanê bi nameyê Arî Foz Welo, Celal Îbrahîm û ciniyêka bi nameyê Ferîde Ehmede şehîd kewtî. 2 kesê bînî zî birîndar bîyî. Ciwanê taxe vera hêrişê rejîmê de çalakîya xo açarnayî serewedaritişêko gird û heyfê şehîdan girewt; netîceyê nê serewedaritişî de fermandarêko rutbeya ci berze û bi desan endamê rejîmî ameyî kiştene û wesayîtê înan ameyî veşnayene.

### BI ADIR NÎŞAN DA

20ê adara 2004î de bi hezaran şarê taxa Eşrefîye û Şêxmeqsudî vejîyayî rasteyan û hêrişê rejîmê Baasî şermizar kerdî. 26ê adare de şorişger û hunermendo pîl Yekta Herekol (Erdogan Qehreman) ke taxa Şexmeqsudî de xebat meşnayêne, rasteyê Seedelah El-Cabirî ya Helebî de bedenê xo veşna û resa şehadet. Nê çalakîyan hêzê rejîmî kerd mîyanê tersî û êdî vera çalakîyan de vengê xo nêkerdî.

### TAXA EŞREFÎYE

27ê kanûna 2007 de hêzê rejîmê Baasî hêrişê çalakîya kurdan ya sûka sebzeyan ya taxa Eşrefîye kerd û bi seyan kurdê ke taxa Şêxmeqsud û Eşrefîye de bî, tepiştî. Ciwanê bi nameyê Ceger Şêxo ke amebî tepiştiş, par şehadetê ci ame îlankerdiş. Ciwanê bi nameyê Sefqan û Şukrî hema zî nêameyî dîyayîş.

### AMEYE PÎROZKERDIŞ

Hêzê rejîmê Baasî serra 2009 de hêrişê aktîvîteya pîrozkerdişê Newroze ya Reqqa kerd û netîceyê hêrişî de bi desan kurdî ameyî qetilkerdiş. Vera nê qirkerdişî de şarê Helebî bitaybetî zî yê ke taxê Şêxmeqsud û Eşrefîye de manenî, bi çalakîyêka meşaleyin viraştî. Labelê hêzê rejîmî reyna hêriş kerdî. Şar zî vera nê hêrişan de na rey serewedaritişê xo hîna gird kerd û reaksîyonê xo bi hawayêko hîra nîşan da... *HELEB - ANHA*

*(Do bidomîyo)*

## Serewedaritişê 2011î

**NOBEDARÊ SÎNORÎ YÊ** rejîmê Sûrîye 2011 de ser sînorê bajarê Dêrikî yê Kantonê Cizîrî şorişgerê bi nameyê Şoreş û Masîro ke Heleb de xebate kerdênê, ameyî qetilkerdiş.



Nê semedî ra Partîya Yewîya Demokratîke (PYD) seba çalakî veng daybî. Bi vengdayîşê PYDyî bi seyan kesî vejîyayî cadeyanê Şêxmeqsudî.

Meş, cadeyê 20î yê Şêxmeqsudî de dest pêkerd. Dima ra hêzê rejîmî bi hûmarêka girde hêrişê çalakvanan kerde. Labelê çalakvanan meşê xo bêtirs domnayî. Hêzê rejîmî seba ke şar çalakîye biqedêno, dest bi tepiştişan kerd, hêrişê keyeyan kerd û bi seyan ciwanan tepişt.

## Vîrardişê Qamişlo

SERRA 2005 DE heme Rojawan û herêmê Sûrîye ke kurdî tede cuyenî, nê cayan de seba vîrardişê şehîdê qirkerdişê Qamişlo çalakîyî ameyî viraştene. Taxê Şêxmeqsud û Eşrefîye de zî 12ê adare de çalakîyê vîrardişî ameyî viraştene, labelê hêzê rejîmî reyna hêrişê nê cayan kerdî û xeylê kesî ameyî tepiştene. 16ê adare de bi seyan kesê taxê Eşrefîye û Şêxmeqsudî seba vîrardişê şehîdê Qirkerdişê Helebçe mîtîngêk organî kerdî. Şewa Newroze de kurdan roşanê newe ra welidîyayîşî pîroz kerd. Labelê hêzê rejîmî hêriş kerdî û bi desan kurdî taxa Eşrefîye û Şêxmeqsud de tepiştî. Labelê vera nê hêrişan de kurdî çalakîya xo hîna zêde kerdî û hêzê rejîmî mecbûr mendî ke kesê tepiştbî, veradî.





# Êzidîyî kamp de raştê vatişê nefretî yenî




Hêzê dewlete êzidîyê ke Amed û Nisêbînî de bîy, bi zorî berdbî kampê AFADî ke Qezaya Mîdyadî ya Mêrdînî de ya û nika pêro pîya 12 hezar bextwaştoxî kamp de manenî. Êzidîyî kamp de erebê ke Sûrîye ra ameyî reyde, manenî. Êzidîyî dîyar kenî ke kamp de raştê cîyayî û heqaretî yenî. Babete ser o cinîyê êzidî qisey kerdî. Cinîya bi nameyê Zere Haci Xelefe ya şengalije va 'ma wazenî kamp de bi hawayo seyyewbînan rêze bivînî' û qiseykerdişê xo wina domnaye: "Dewlete ma bi zorî kampê Nisêbînî ra vete û ard kampê AFADî de bica kerde. Mîyanê kampî de muameleyo ke vera ma de virazîyeno û vera yê bînan de virazîyeno, sey yewbînan nîyo. Tena waştişêk mi esto, o zî agêrayîşê welatê xo yo. Ma ganî rîyê xo bidî tîje û dua bikerî, la ma nêeşkenî bikerî. Ma tersenî ke îbadetê xo bikerî. Ewja de seba ma cayê îtîkatî çin o. Ma heme çîyanê xo mîyanê çadirî de kenî."

**DOKTOR MA RÊ BIPERE YO**

Cinîyan ra Şeme Hiço Şahape zî wina va: "Ma sey êzidîyê bînî yê ke kamp de yî, raştê heqaretî yenî. Seba ma kamp de doktor û darûyî daxî bipere yî, la eynî çî seba sûrîyeyijan bêpere yo. Melayo ke mîyanê camîyê kampî de waez dano, ma sey hedef nîşan dano. Ma nêyî ra tersenî."

**XEYLÊ PROBLEMÎ ESTÎ**

Xeylê êzidîyê ke kamp de manenî, qiseykerdişî ra tersenî. Bitaybetî cinîyê êzidî vanî 'ma xeylê probleman cuyenî labelê vatişê ci ra daxî tersenî. Seba ke ma tersenî, nêeşkenî teber ra yewî sey mîsafîr bîyarî mîyanê kampî. **MÊRDÎN - ŞÛJIN**

# 10 serrî yo ke nobeda edaletî dewam kena

**Rojnameger Umît Kivanço ke embazê Hrant Dînkî yo, derheqê doza Hrant Dînkî de va 'hewl danî ke berpirsîyarîya doze bierzî ser tayê kesan' û wina domna: "Mîyanê nêyî de AKP zî tede, zaf kesî estî"**

YASÎN KOBULAN / STENBOL - DÎHABER



Her çiqas ke qetilbîyayîşê Mudirê Weşanê Pêroyî yê Rojnameyê Agosî Hrant Dînkî ser ro 10 serrî derbaz bîyî zî nobeda seba gêrayîşê edaletî hema zî dewam kena.

Babete ser o avûkatanê Dînkî ra Hakan Bakircioglu, rojnameger Umît Kivanç û Mudirê Weşanê Pêroyî yê Nor Radyo Dîren Cevahîr Şene qisey kerdî.

Avûkat Bakirciogluyî va 'badê ke ma muracatê çend cayan kerd, qerarê cigêrayîşêko hîra yê cînayetê Dînkî ame girewtiş' û wina domna: "Nê qerarî ra dima dest bi îfadegirewtişê wezîfedarê dewlete û kesê ke cînayet de ca girewtî ame kerdiş. Dima ra derheqê 27 wezîfedaranê dewlete de îdîaname amade bîye."

**DOZÊ NEWEYÎ ABÎY**

Bakircioglyî va 'goreyê Serdozgerîya Stenbolî, roja qetilbîyayîşê Dînkî de Fermandarîya Cendirmeyan ra çend leşkerî zî cayê hedîseyî de estbîyî û nê kesan qatil Ogun Samastî taqîp kerdo' û wina dewam kerd: "Nê zanayîşan ra dima ganî dozê neweyî bêrî akerdiş. Her çiqas ke doze 9 serran ra dima ameye akerdiş zî no çîyêko muhîm o. Ganî Serdozgerîya Komare ya Stenbolî çîyê ke no proses de ameyî cuyayîş, bişopno û goreyê ci îdîaname amade bikero. Ganî muracato ke ma seba mehkemekekerdişê Velî Kuçuk, Kemal Kerînçsîz, Oktay Yildirim û sewbîna kerdbî, bêro qebulkerdiş."


Dîren Cevahîr Şen


Umît Kivanç


Hakan Bakircioglu

**NOBEDARÎ QISEY KERD**

Umît Kivançî dîyar kerd ke 'ma destpêk ra nata tim va ke no cînayet hetê organîzasyono ke mîyanê dewlete de yo ra ameyo kerdiş' û wina va: "Hewl danî ke cînayetî bierzî ser tayê kesan. AKP zî tede, xeylê kes û hêzî mîyanê nêyî de estî. Nika wazenî têkilîya cînayetî Cematê Gulenî reyde ronî. Sankî verê cû Ergenekoncîyî qet nêbîyî û heme çî hetê FETOcîyan ra ameyo kerdiş, nîşan danî. Muxalefetî ra tayê kesî daxî nêwazenî cînayet roşn bibo. Rewşa Garo Paylanî orte de ya. Tirkîya de seba ermenîyan çîyêk nêbedilîyayo. Hîna zî çekuya ermenî sey lengî yeno dîyayîş û ma welatêko winasî de cuyenî."

**WAZENÎ SE BIKERÎ**

Dîren Cevahîr Şene zî wina va: "Mehkemekerdişo ke 10 serrî yo dewam keno de hema zî berpirsîyaran hesab nêdayo. Çira îdarekarî nêvejîyenî mehkeme ver? Ma qatilanê rastikênan şinasnenî. Ganî îfadeyê heme îdarekaranê o wextî bêro girewtiş. Wazenî cînayetî tena FETOcîyan reyde sînordar bikerî û bi no hawa wazenî berpirsîyarîya cînayetî xo ser ra bierzî. AKP nêeşkeno bi vatişê 'ma amey xapênayîş' xo pak bikero. AKP ortaxê sucî yo."

**DO BÊRO VÎRARDIŞ**

Heto bîn ra Serrgêra 10. yê qetilbîyayîşê Mudirê Weşanê Pêroyî yê Rojnameyê Agosî Hrant Dînk do ewro bi aktîvîte û çalakîyan bêro vîrardiş. Ewro saet 14.00 de cayo ke Dînk amebî qetilkerdiş de merasîmê vîrardişî do bêro viraştiş. Saet 20.00 de zî Akbankê Kurtuluşî ra ver bi Agosî do meş bivirazîyo.

## Ganî OHAL bêro wedarnayîş

Çend rojî verê dozgerîya Anqara bi qanûnê 301. derheqê Komeleya Heqê Merdiman (ÎHD), Weqfa Heqê Merdiman ya Tirkîya (TÎHV), Sendîkaya Kedkaranê Weşî (SES), Komeleya Heqê Merdiman û Piştîdayîşê seba Mazluman (MAZLUMDER) de bi îdîaya raporê ko wextê qedexeyê tebervejîyayîşî de ameyî amadekerdiş de 'heqaretê tirkî, komare, dewlete û sazîyê dewlete bîyo' ra tehqîqat daye destpêkerdiş.

Babete ser o Îdarekara ÎHDyî ya Amedî û Endama Komîsyonê Cinîyan Gulistan Gencel Yalçindage qisey kerde.

**MA EŞKENÎ HESAB BIDÎ**

Yalçindage bale ante neheqîyan ser û wina va: "Heta nika ma ti kesan rê neheqî nêkerde. Sazîya ma hetê yewîya şaran, aştî û azadî de xebatan kerde. Ma amadekerdişê raporan de zaf hesas hereket kerd. Xebatê ma ra yew zî raporê heqan o. Badê amadekerdişê raporan, ma netîce tim bi şaran pare kerdêne. Derheqê raporan de hesabo ke ma nêşînbî bidî, çin o."

Yalçindage peynîya qiseykerdişê xo de wina va: "Amadekerdişê raporan û parkerdişê netîceyan, heqê ma yo xozayin o. Rewşa OHALî de bi qerarê KHK sazî û sendîkayê ma ameyî padayîş.



Rewşa OHAL û dergkerdişê OHALî çîyêko antî demokratîk o. Vatişê şer û şiddetî, çareserî û aştî nêano. Seba demokratîkbîyayîşî, ganî OHAL bêro wedarnayîş." *AMED - ŞÛJIN*

## Şûjin êdî bi kirmanckî zî weşan keno



**Rojnameyê Şûjinî yo ke bi lehçeyanê ziwanê kurdî ra kurmancî û soranî, ziwanê îngîlîzkî, erebî û tirkî weşan kerdêne, nika lehçeya kirmanckî zî kerd lîsteya xo û dest bi weşana lehçeya kirmanckî kerd.**

**Sey ke yeno zanayîş UNESCOye lehçeya kirmanckî girewtbî lîsteya ziwan û lehçeyê ke ver bi vînîbîyayîşî şonî. Rojnameyê Şûjinî zî bi hêzê cinîyan dest bi weşanê xo yê lehçeya kirmanckî kerd.**

**Babete ser o edîtora beşa kirmanckî Gulçîn Şanliye qisey kerde.**

**GANÎ ZIWAN BÊRO PAWITIŞ**

**Şanliye dîyar kerde ke 'Şûjin ajansê cinîyan o' û wina dewam kerde: "Lehçeya kirmanckî çinbîyayîş ver de yo. Ganî ziwanê dayîke bêro pawitiş. Şûjin ra ver, ez JIYAN TV de xebetîyaya. Ewja de ma xebatê kirmanckî kerdênê û vera polîtîkayê dewlete de ziwanê xo pawitênê. Labelê dima ra JIYAN TV ame qefelnayîş. Ziwan tena aletê yewbînan famkerdiş nîyo. Ziwan nasnameyê şaran o. Komele de ziwan û kulturê merdimî bêro qedexekerdiş, heme çî destê merdimî ra yeno girewtiş. Ganî ziwan û nasname bêro pawitiş. Pawitişê ziwanî de wezîfeyo tewr gird keweno milê cinîyan ser." AMED – ŞÛJIN**

# Kobanê bi moralê şerwanan serkewte

SÎNAN DENÎZ / KOBANÊ - ANF

Erdê Kurdistanî de bi hezaran cu û hîkayeyê şerwanan estî. Kesê ke Şorişê Rojawanî ra tesîr bîyî û beşdarê şorişê azadî bîyî, zaf î. Rojawan de çeteyê DAIŞî nêeşkayî vera şerwanan de bivinderî û bi no hawa Kobanê serkewt. Hêzê teber û çeteyê DAIŞî omid kerdênê ke Kobanê do bikewo destê înan. Labelê netîceyê Şorişê Rojawanî sey hesabê înan nêbî û Kobanê de şorişê azadî, ruhê embaztî serkewt.

Arjîn Kobanê ya ke dewa Xor Xorî de ameya dinya, şerê kantonê Cizîrî, Til Hamîs, Ceza, Serêkanîyê û Til Koçer de ca girewt. Arjîn Kobanê badê beşdarbîyayîşê xo mîyanê embazanê xo de wendiş û nuştişî musaye.

Babete ser o Arjîn Kobanêye qisey kerde.

**BÊOMIDÎ ÇINÊBÎ**

Arjîn Kobanêye qiseykedişê xo de qala embazê xo yê ke şehîd bîyî, kerde û wina va: "Tena yew hedefê mi esto, o zî heyfgirewtişê embazê mi yê ke mi ver de şehîd bîyî yo. Şerê Rojawanî de bêomidî çinêbî. Kewtişê Kobanê ameyêne manaya kewtişê heme erdê Rojawanî. Şerê Kobanê bi moral û fedakarîyê embazan serkewt. Çeteyanê DAIŞî bi tanq, top, hawan, dokça û fuzeyan ameyênê ma ser de. Embazî her çiqas ke rincan, vêşan û bêhewn mendênê, reyna zî şer kerdênê û destê xo sîlehî ra nêantênê."

**NÎNO VÎRÎKERDIŞ**

Arjîn Kobanê bale ante hesabê ke hêzê teberî înan ser de kerdênê û qiseykerdişê xo wina qedênaye: "Dewleta tirk û Serekkomarê înan paweyê kewtişê Kobanê bîy. Ez taxa Azadî de birîndar bîya. Engiştê wirdî destê mi zî qerefîyayî û vînayîşê çimê mi zî kêmî bîyî. Mi Amed de tedawî dî. Şerê Kobanê de fedakarîya şarê Vakurî nîna vîrîkerdiş. Ez bi motîvasyonê şarê Vakurî weş bîya. Embazê ma her çiqas ke bîyênê gazî, reyna zî vera çeteyan de tewr vernî de şer kerdênê."



ROJEVA Mêdya
19 Çile Pênçşem 2017

ROJEVA MEDYA Ararat Basın - Yayın Reklamcılık Adına
İmtiyaz Sahibi: Murat SEKMEN

Yazı İşleri Müdürü: Mehmet Çetin ALTUN
Yönetim Yeri: Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3 Yenişehir-DİYARBAKIR

Tel: 0 (412) 224 35 93
Baskı (ÇAP): İstanbul: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah.

Akasya Sok. No: 23/A Küçükçekmece İSTANBUL
Tel: 0 (212) 580 63 81
Adana: Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık

Yeni Doğan Mah. 2108 Sok. No:13/A Yüreğir / ADANA
Tel:0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
e mail: rojevamedya@hotmail.com

# Kuçeyên Mêrdînê bê deng in

Mêrdîna ku li hemberî deşta Mezopotamyayê hatiye avakirin, xwedî dîmeneke bêhempa ye. Bajarê ku yek ji muzeyên servekirî tê hesibandin, bi malên xwe yên kevirî, bi xan, dêr û mizgeftên xwe li gel hemû pêkutiyên dîrokê jî li ser pêyan maye.


Li kuçeyên bajarê ku malovaniya kurd, ereb, ermenî, keldanî û asûriyan dike li hêlekê ji mizgeftan dengê ezanê, li hêlekê jî ji dêran dengê naqosan hildibe. Bajarê ku bi kuçeyên xwe yên teng ku wesayît nikarin tê re derbas bibin, bi abbarayên xwe li cîhanê hema bêje hemtayê wê tune ye û her wiha ji ber taybetmendiyên xwe yên dîrokî ji aliyê UNESCO'yê ve di Lîsteya Mîrateyên Cîhanê de cih digire.

Li vî bajarê dîrokî û qedîm, niha her çi qas bi hilatina rojê re mêrdînî dadikevin kuçeyan jî, lê bi awayekî aşkera tê dîtin ku ew qelebalixa berê ya li van kuçeyan êdî tune ye.

Li bajarê ku berê di her çar demsalan de jî wargeha turîstên xwecih û biyanî bû, di demên dawîn de hema bêje mirov li kuçeyên wê rastî turîstan nayê. Dema mirov li kuçeyên dîrokî digere, ji bilî niştecihên bajêr pir rastî kesî nayê. Ji bilî çend welatiyên ku ji bo temaşekirina avahiyên dîrokî û deşta Mezopotamyayê carinan derdikevin ser baniyên bilind, çav bi kesî nakevin û her wiha ew kafeyên ku berê tijî bûn, niha hema bêje vala ne.

Bi kêmbûna turîstan re, li bajar êdî rûyê esnafan nakene û êdî li Mêrdînê ew tehm û şanaziya berê nayê dîtin. **MÊRDÎN - DÎHABER**





# Karê paqijiya Mêrdînê li ser pişta KERAN E

AYNUR ÎNEDÎ / MÊRDÎN - DÎHABER

Li Mêrdînê, ji ber kuçeyên wê yên teng û binêrdewan kar û barê berhevkirina çopan bi salan e li ser pişta keran tê veguhastin. Peywirdarên ku bi 48 keran kuçeyan paqij dikin jî, hem ji şert û mercên xebata ew dikin û hem jî ji zor û zehmetiyên ku ker dikêşin bi gilî û gazinc in.

Ji karkerên paqijiyê Abdurrahman Ozgun diyar kir ku ew her sibe saet di 06.00'an de dest bi kar dikin, heta êvarê dixebitin û anî ziman ku li gel ew qas xebatê jî roja wan a destûrê tune ye. Ozgun balê kişand ser zehmetiyên karê ku ev 8 sal e dike û wiha bertek nîşan da: "Em li vir tenê çopan berhev nakin. Em kurtanan çêdikin, axurê keran paqij dikin, êm, av û dermanên keran didinê. Lê dîsa jî em wekî karkerên taşeron tên xebitandin."

Ozgun destnîşan kir ku di karê niha de tu mafekî wan û ewlehiya wan tune ye û nahêlin ew pirsgirêkên xwe bînin ziman.

Peywirdarekî ku nexwest navê xwe bibêje jî destnîşan kir ku hin ker ji ber baş li wan nayê nihêrîn, bi zorê dikarin bixebitin û destnîşan kir ku di lingê gelek keran de pirsgirêk hene lê kes li wan mêze nake.

# Parçeyekî jiyana jinên Koçer: TÛRIK

Jinên koçer ên ku jiyana wan li zozan û konan derbas bûye her çi qas ji ber neçariyê hatibin bajêr jî bêyî tûrikên xwe nikarin îdare bikin



Koçerên ku di salên 90'î de gundên wan ji aliyên dewletê ve hatin şewitandin û rûxandin, li hin taxên Êlihê bi cih bûn. Lê dema ku koçer ji gundên xwe hatin derxistin jiyana xwe ya gund jî bi xwe re anî bajaran. Koçerên ku li gundên xwe karê sewalkariyê dikir, ji ber ku bi darê zorê ji warên xwe bûn, li bajêr li şûna adapteyî jiyana bajêr bibin zindîkirina çanda xwe tercîh dikin.



Jinên koçer ên jiyana wan li zozan û konan derbas dibe, bêyî tûrê ku nîvê jiyana wan e û di dema kar de gelekî bi kêrî wan tê, heta zarokên xwe jî tê de xwedî dikin, nikarin îdare bikin. Tûrê ku di nav cihêzên her jineke ciwan de cih digire, bi reng û nexşên xwe hê jî li navenda Êlihê ji aliyê koçeran ve li sûk û bazaran di dema danûstandinan de tên bikaranîn.

Jina bi navê Fatma Yildiz anî ziman ku tûr bi taybetî dema kirina karê sewalvaniyê de pir bi kêrî wan dihatin û wiha got: "Piştî em ji bêriyê vedigeriyan, me meterên şîr dixistin tûr. Dîsa ji bo zarokên me necemidin û negirîn me betanî li dor wan dipêça û ew dixistin nav tûr. Ez hîn jî neviyên xwe dixim hundirê tûr. Tûr tiştekî pîroz e. Mezinên me çêkirine û bi kar anîne. Niha em bi kar tînin."

Yilmaz diyar kir ku tûrê li gel wê ji xesiya wê jê re wek mîrate maye û ev tişt anî ziman: "Ev tûrê niha di dest min de ji xesiya min maye. Xesiya min heta sax bû tim bi kar dianî, bi dehan zarok tê de xwedî kirin. Ez ê jî heta mirinê vî tûrî veşêrim û bila ji zarokên min re bibe mîrate. Mezinan heta roja îro ev çand anî, em ê jî ji zarokên xwe re bihêlin."

Her wiha Yilmaz da zanîn ku dema ew diçe bazarê tûrikê xwe bi kar tîne, heta zarokên xwe jî dixinê û li pişta xwe dikin û gotinên xwe wiha bi dawî kir: "Ev çandeke koçeran e û em jî li gorî vê çandê tev digerin. Di nav cihêzên her jineke ciwan de cih digire. Di nav cihêzên jinan de du cure tûr hene. Yek ji bo kar û bar, yek jî ji bo zarokan e. Cihêzên berê wisa dihatin amadekirin." **ÊLIH - DÎHABER**


# 30 sal e li heman kolanê ye

BERÎVAN KARATAŞ / AGIRÎ - DÎHABER

Mustafa Yol (64) ê ku bûye yek ji wan navên sembola Bazîda Agiriyê, li kolana bajêr a herî qelebalix Cadeya Agiriya Mezin li heman noqteyê nêzî 30 sal e hemaltiyê dike. Yol li nav refuja ku li nav kolanê, bêyî ku guh bide germa havînê û sermaya zivistanê disekine û bi karê xwe re eleqedar dibe.

Yol diyar kir ku ew û malbata xwe 34 sal berê ji ber xizaniyê ji gundê Kutlubulak ê Bazîdê koçî navenda Agiriyê kiriye û got ku ew ji bo malbata wî muhtacî kesî nebe hemaltiyê dike. Yol anî ziman ku ew her roj di 4'ê sibê de ji malê dertê û diçe cihê xwe û li benda kar disekine û wiha axivî: "Kesên karê malzemeyên înşaatê, komirê, veguhêzkariyê dikin, dizanin ez li vir disekinim. Her sibe tên min ji vir dibin. Piştî karê min diqede dîsa têm cihê xwe û disekinim. Heta niha min dest li ber kesî venekiriye û ez ê venekim jî. Malbata min bi min serbilind e."

Her wiha Yol destnîşan kir ku nîvê temenê wî li vê kolanê derbas bûye û wiha pê de çû: "Hema bêje ev kolan û ez di heman temenî de ne. Ez di vê kolanê de ji mirinê bigire heta neheqî û kêfxweşiyê bûm şahidê her tiştî."

www.arsivakurd.org